# xalê min ferîd

PAŞA UZUN



Vate

# XALÊ MIN FERÎD

## Paşa Uzun

Kitêb: 18

Biyografî: 1

Xalê Min Ferîd

Paşa Uzun

Çap: Berdan Matbaacılık

Îstanbul, Tebax 2006

Edîtor: Deniz Gunduz

Redaktor: Roşan Lezgîn

Mîzanpajçêker: M. Alî Variş

Grafîkçêkera qapaxê: Nuran Gundoxdu

© Paşa Uzun

ISBN: 975-6278-09-9

Weşanxaneyê Vateyî

Adres:

Katip Mustafa Çelebi Mah.

Tel Sok. No: 18 Kat: 3 Beyoğlu/ İstanbul

Tel: 0212-244 94 14

E-posta: kovaravate@yahoo.com

*Ji Ruhsar û Yekbûnê re.*

*Ez ji bo alîkariya wan ji Ruhsar Uzun, Sakîne Uzun,*
*diya min Seadet Uzun, Ahmet Belet, Adem Avcikiran,*
*Îbrahîm Kureken, Mustafa Aksakal, Eyup Surek,*
*Sîno Xurşîd, Zinarê Xamo, Ahmet Guleken,*
*Remzî Kerîm, Mistefa Uzun, Malmîsanijî*
*re spasiyên xwe ji dil pêşkêş dikim.*

## Pêşgotin

Ji kuştina Ferîd heta niha 27 sal derbas bûne, gelek însan bûn guhdar û şahîdên gelek tiştan. Devê xelkê ne çewal e ku mirov bidirû û çavên xelkê ne mumkun e bêne gêridan. Her kesî tiştek dît, tiştek bihîst û her kesî gor dîtin û baweriya xwe tiştek got. Her kesî ciyekê nîşan da, gor hinekan mêrkuj ji aliyê çepê bû, gor hinekên din jî axa û kevneperest bûn.

Li ciyêk wek welatê me bûyerên wisa zû bi zû ji holê ranabin. Guhertina nivşên kevn zahmet e, civaka me ji bo kelmêsekî dikare zarokên xwe bi xwînsarî û hovitî qetil bike û dike jî.

Divê di jiyana me ya cîvakî û siyasî de gelek tişt bên guhertin. Ê herî girîng, divê em di mejî, dil û wîcdanê xwe de qîmeta canê însanan hildin ciyekî bilind û muteber. Di edebiyat, şiîr, kilam, senat, sînema û mekteban de vê meziyetê di mijûyên nivşên nû de bineqişînin. Ger em bikaribin zarokên xwe bi meziyetên însanî mezin, terbiye û hîn bikin, wê gavê rojepêşên me zêdetir ronahî bin.

Milletekî wek me reben, belengaz û bê xwedî divê vê prensîba hanê rake ser serê xwe, ji xwe ra bike rêber, wîcdanê xwe

bike mehkeme. Di mahkema wîcdanê xwe de li hember mêrkujî û brakujiyê derkeve û fiêlên wisa mahkûm bike.

Heya nuha hem wek ciwat û hem jî wek ronakbîrên welatekî bindest me di vî warî de îmtihanekî baş nedaye, axlaqekî hember mêrkujî, birakujî avakirin tu caran di bernama me de cîh negirtiye.

Milletê ku nikaribe li miriyên xwe xwedî derkeve, ew ê çawa li saxan xwedî derkeve?

Yê herî xirabtir, gelek ronakbîr û siyasetmedarên me, dem bi dem li gor bayê, ebe û cubeyên xwe dugeherînin, destên xwe dixin nav destên mêrkuj û brakujan, bê fedî û bê ar xwe wek pêşverû û welatxelasker ji xelkê re pêşkêş dikin.

Pêwestiyekî wisa giran em ê kengê bidin ber xwe jî hîn ne bellî ye. Bes mêrkujî û birakujî berdewam e, delalên wek Ferîd, wenda bûn û wenda dibin, sal tên sal diçin, bes siya mirinê li ser zarokên milletê me winda nabe, her ku dere tarîtir û girantir dibe.

Hêviya min ev e ku dûr an nêzîk, yên ku biryara kuştina Ferîd dabûn, di huzûra milletê me da bên mahkûmkirin.

Bes Ferîd paş da nayê, birîna dilê Ruhsarê rehet nabe.

Gava ez dest bi nivîsandina vê kitêbê dikim, êdî 27 sal derbas bûne. Cara yekemîn ez diçim ser mezelê Ferîd, hevalên wî jê re mezelekî xweşik çêkirine, li ser kevirê sipî sala bûyina wî hatiye neqişandin.

Gava ez li ber mezelê wî disekinim, dixwazim ew rabe, qet nebe ji min re bibêje;

- Tu ji bo çi ewqas dereng mayî?

- Te ji bo çi li halê min nepirsî?

Deng ji wî nayê, serê min dikeve ber min, ez digirîm.

## Ferîd tê dinê

Her cara ku diya min behsa serpêhatiyên xwe yan behsa bûyeran dike ez mat û heyran dimînim. Di gotinên wê de wext nîn e; ne saet, ne meh û ne jî sal... Wek em hemû însan di wextek bê serî û bê binî de dijîn, mesafeyên di nava bûyin û mirinê de wenda dibin. Diya min heyşt zarok anîne dinê, lê kîjan rojê an kîjan mehê zariyên wê çêbûne ne ew û ne jî kesekî din dizane.

Xwedê bi rehma xwe şa bike, apê min Hesen tarîxa bûyina zarokan bi destnivîsa xwe li paş resmekî ku me xistibû nav çarçoveyek û bi dîwarê odê ve bi dar da kiribû, dinivîsand. Gava ez ji hefsê derketim ew resm jî wek gelek tiştên din wenda bûbû.

Ferîd di bihara sala 1945an da tê dinê, bes ez dixwazim ji devê diya xwe guhdariya bûyina Ferîd bikim.

Ji rojan rojekê, biharê bi giraniya xwe çarşefeke şîn li erdê Swêregê raxistiye, bîhna kulîlk û nefelan daketiye ser Swêregê, diya min û xwungên wê li Helawikê, li nav bîstên dendikên zebeşan diçînin. Xebera xêrê digîhîje bîstên ku dakê Kejo lawikek aniye dinê. Navê Ferîd li lêwik dikin. Beriya Ferîd sê

keç û sê law hene, Ferîd dibe zarokê heftan, êdî li pêy Ferîd dakê Kejo zaro çê nake. Ferîd dibe zarokê dawî, dibe şîr û şekirê malê. Ew dibe zaroyekî biharê, zarokê kulîlkan, nefelan, giyayên êşîn.

Sirûştê, serma û seqema zivistanê li dû xwe berdabû, dar û daristan, gul û kulîlk bi darmêwan ra tev bi çîçekên rengareng rabûbûn ser piyan, Ferîd jî bi wan re çavên xwe li biharê vekiribû û bi biharê re jiyaneke nû, jiyaneke teze û xweşik dest pê dikir. Dilpakî, biratî û hevaltiya wî wek bîhna nefelê, bîhna darên sincan ji der û dora xwe re, ji bav, bira û xwungên xwe ra, ji heval û dostên xwe ra germayî, xweşî, ken, henek û dilgeşiyê bela dike, bi eşqa dilê xwe dilê wan jî geş û xweş dike.

Wê demê dayikên me, zarokên xwe li mal tînin dinê, pîrên mehelê yên zane û xwedî tecrube alîkariya dayikan dikin. Zarokên der û dora mehela me bi destên meta Gulo, Zuloya Cana û Altûna Çavişan tên dinê. Gava jana dakê Kejo dest pê dike Zuloya Cana ne li mal e, ji ber wî yekê ban Gula Delî Eliya dikin, di şûna meta Zilo da Gulê dibe pîrika Ferîd.

Gava çelê Ferîd xelas dibe, dinêrin ku nigên Ferîd xwar in. Apê Sefo dibêje, emê lawikê nigxwar çi bikin, herin Abdullahê Botî bînin, bira derziyekê li vî lawiki xe ku lawik bimire. dakê Kejo ban pîrika min Bêzê dike. Bêzê dayika bavê min e, ew jî dimilî ye, gava ew û dakê Kejo tên ba hev bi hev re dimilî qise dikin. Bêzê dibêje, "Kejo, ev lawikê ha, te çewt pêçaye ji ber vê yekê lingên wî xwar bûne. Ez ê wî bi babetekî dinê bipêçim ew ê lingên Ferîd rast û baş bibe." Û wisa jî dibe. Demekî şûn da lingên Ferîd wek spîndaran rast dibin.

Diya min xwunga Ferîd e, ji Ferîd mezintir e. Diya min û bavê min di yek şevê û yek saetê de tên dinê. Gava salên wan

dibin sêzdeh dergîstî dibin, çardesalî dizewicin. Sala ku diya min dibe bûk Ferîd heft, heyşt mehî ye, çile ye, serma û berf li erdê ye. Di salên 40 û 50yan zivistanên Swêregê wek niha nerm û germ nîn in, sermakî xurt hukum dike, berfa ku zivistanan dibare bêhêsab e, derî û paceyên xaniyan di bin berfê de dimînin. Di zivistaneke wisa giran, bi serma û seqem de Ferîd hevt mehên xwe tije dike, bi meş neketiye bes bi çarpiyan dimeşe.

Navê pîrika Ferîd Zeyno ye. Me jê re digot "Pîro", Ferîd jî di nav de, em hemû bi çîrokên Pîro mezin dibin. Di wê demê de televîzyona me kesekî tune, radyoyeke bavê min Hesen heye, lê belê kêfa me zarokan ji radyoyê re nayê, bi taybetî şevên zivistanan em hemû zarok diketin bin kursiyê û bi matmayî me li çîrokên Pîro guhdarî dikir. Çîrokên ku Pîro ji me ra digot, ji sînemaya Hollywood jî wêdatir bûn, her çîroka Pîro wek neqşên dolbendên serên dayikên me, di nava mijûyên me da ciyê xwe digirt.

Ji diya Ferîd re me digot "dakê Kejo", navê wê yî rastî Kezîban bû.

Zaroktiya xwung û birayên min Sakip di navbera mala me û mala xalo Ferîd de derbas dibû. Dema ku em ne li mala xwe bûn, dihat wê maneyê ku em li mala dakê Kejo bûn. Li gor diya min dakê Kejo ji Dêrsimê bû, kengê ji Dêrsimê hatine Swêregê, ji bo çi hatine ez nizanim. dakê Kejo dimilî, kurmancî û piçek jî tirkî dipeyivî. Însaneke pir sosyal, bînfireh, û suhbetxweş bû. Gava niqare û zirne lê diket zû bi zû xwe nedileqand, divê yekî piyê wê bigirta bikşanda nava govendê. Beriya ku rabe ser xwe, ji bêrîka xwe qutiya enfiyê derdixist, piçek dixist nav du tiliyên xwe û dikşand pozê xwe û li govendê ciyê xwe digirt. Wek li ser

ewran bilîze, te di got qey lingên wê nagîhîjin erdê. Bejna kinik, lingên sivik wek têlên tenbûra Ferîd dilerizîn.

Apê Sefo bavê Ferîd e. Di jiyana me hemûyan de ciyekî wî yê taybetî heye. Li gora dema xwe pir pêşda ye. Xeybetên rojane, teq û req û teşqelên eşîrî li ba wî tunene. Însanekî henekxweş e.. Rojekê li Mêrgehmedê, li ber yazixana Otoşarkê bi pîrika min dakê Kejo re rûniştiyê û li benda bav û xwunga min e. Bavê min û xwediyê Otoşarkê, Îhsanê licêyî hem heval û hem jî kirîbên hev in. Kalikê min ji camêrê ber yazixanê re dibêje em xwesî û xenzûrê Emer in, Emer bavê min e, li Swêregê Otoşark destê wî de ye, camêr zêde rû nade wan, bîskî şûnda bavê min û xwunga min tên wir. Camêrê ku rû nade Apê Sefo radibe ser xwe, ber bi bavê min baz dide, serxweşiyê li bavê min dike, qîmet û rûmeta xwe ji bavê min re nîşan dide. Apê Sefo nikare xwe bigre, radibe ser xwe, destê xwe ji para davê şalwarê camêr û dibêje, "Şeqên dirêj şalwerê fire, illa pere illa pere!"

Henekçîtiya Apê Sefo derbasî zarokan jî dibe, bi taybetî qîzên Apê Sefo di jiyana sosyal de gelek azad û henekçî ne.

Apê Sefo dema bi rê de diçû hertim li fîtika dixist. Dinê ne xema wî bû. Xwarina wî, mekteba zarokên wî, henek û kêfên rojane jiyana wî bûn. Divê her roj goşt bixwara, xwarina bê goşt ne xwarin bû. Bes wî tu caran kîlo li xwe zêde nekir, zirav û çeleng bû, şewqeyê xwe xwar dikir, destên xwe dida paş pişta xwe û fîtika xwe lê dixist û dimeşiya.

Ji xoceyên camiyan re tu cara hurmeta wî tunebû. Ji me re digot, lawê min evana ne rast in, li camiyê tiştekî dibêjin li mala xwe û di jiyana xwe ya rojane de tiştekî dinê dikin. Dema nas û cîranên me, merivên welatê me birçî û tazî bin ji me re tiştek ferz

nîn e, ne rocî, ne hec û ne jî nimê û camî. Divê em beriya her tiştî birçî û taziyên xwe têr bikin, ji wan ra alîkar bin. Heta ku em vê wezîfa xwe neynin cîh her gotina ku em dibêjin vala ye.

Apê Sefo di jiyana xwe de, tu carî lingê xwe navêt hundirê camiyê, tu carî rocî negirt û tu carî nimêj nekir. Ji ber wê yekê xoceyên mehela me ji bo Apê Sefo digot, "Ew kafir e!"

Dema ez zaro bûm dikana Apê Sefo li ber devê xana Hec Ûsib bû. Li wir caw difrot. Bêyî dikanê li ser riya Gebendirîsê erdê wî hebû. Apê Sefo hemû mal û milkê xwe dabû ber lingên zarokên xwe, digot bira zarokên min mektebê bixwînin bira ez jî li ser cila reş rûnim, ez ê hemû erdê xwe bifroşim û wan bidim xwendinê. Û wisa jî kir, erdên xwe bi perekî pir kêm firot û zarokên xwe da xwendin.

Di mehela me da, xortên ku li derveyî Swêregê mekteb dixwend ji pênc tiliyan zêtir nebûn. Gava wext û saet temam bû zarokên Apê Sefo yek û yek çûn derveyî Swêregê û dest bi xwendina xwe kirin.

Xalo Mehemed ji Hesen û Ferîd mezintir bû. Herî pêşin wî dest pê kir. Herî mezinê wan xalê min Abdo bû, bes xalo Abdo tu cara mekteb nexwend, kar û barê wî terzîtî bû. Li Swêregê dû babet terzî hebûn: Yên ku cilên gundiyan didrût û yên ku cilên modern didrût. Xalo Evdo ji babetê yekemîn bû, şalwar, ebe û fîstanê gundiyan didirût. Gava ez vê nivîsarê dinivîsînim ew jî li bajarê Wêranşarê fîstanên bi neynik, pûl û morîkan dineqişîne.

Xalo Mehemed ket mekteba Herbiyê, gava ew havînan dihat mal ji bo me zarokan dibû şênayî. Bi meraq û heyecana dilê xwe, me baz dida mala Apê Sefo. Xalo Mehemed dibe paca me ya herî pêşîn, paceya li hember dinyaya derveyî Swêregê.

Pacayek wisa ku em dikarin tê de bajarên mezin, trênên ku li ser şivên hesinî diçin, erd, ezman û behrên bê serî û bê binî bibînin. Xalo Mehemed bi xwe re ba û bîhnên diyarên ku me ne bi xewnên şevan û ne jî di jiyana xwe ya rojane de didît, ji me re dianîn. Kêfa dilê me bê sinor û bê hesab bû, ger ez bibêjim ji kêfan per bi me ve hêşîn dihatin wê nebe mubalexe. Ji me zarokan hez dikir, bi me re henek dikir, gulaş dikir, em radikirin ser piyên xwe û hiloyî jor dikir.

Kêfa Apê Sefo pir ji wî ra dihat, bes ev kêfa wî dûr û dirêj najot. Di nav herbiyê de inqîlab çêbû, Xalo Mehemed ji Herbiyê avêtin, heqê xwendinê ji dest girtin. Demekî şûn da heqê wanê xwendinê paşda hat dayin. Wî ji nû ve dest bi mektebeke din kir. Mekteba Bilind a Tenduristiyê (Saglik Yuksek Okulu) xelas kir û li Çorimê dest bi kar kir. Piştî demekê tayîna wî hat Diyarbekîrê. Li nexweşxana Nimûneya Diyarbekîrê bû serekê kar û barê îdarî. Sê heb zarokên wî çêbûn, hîna zarokên wî çûk bûn nexweş ket. Cinawirê qanserê wek tofana çiyayê sîpanê xalê min Mehemed ji nav me digre û dixe bin heriya sor a Swêregê.

Qehra apê Sefo û dakê Kejo wek bîra kûr û bê binî ye, xalê min Hesen li Anqerê dibe elektrîkçiyê trênê, xanima wî ji Çorumê ye. Bi hev re dizewicin û li Anqerê bi cîh dibin, ji wan re du zarok çêdibin. Ji welatê xwe, ji dê û bavê xwe dûr dikeve.

Apo û dakê hemû eşqa dilê xwe, wek konê koçeran li ser Ferîd vedikin. Ferîd di nava zahmet û zoriyê de mekteba xwe xelas dike û dibe mihendisê ziraetê. Qehra Mehemed a di dilê dakê û apo de winda nabe, bes piçekî sivik dibe. Ferîdê wan, şekirê dilê wan, kulîlka bira û xwungan, ba û bîhna biharê li wan vedigerîne, xwe li wan dipêçîne, bi bîhna xwe wan serxoş û serbilind dike.

## Li Anqerê

Dema xalê min Mehemed li Anqerê dest bi Mekteba Bilind a Tenduristiyê dike, Hesen û Ferîd li Anqerê ne. Xalo Ferîd li Ziraet Lîsesî sinifa dawî dixwîne. Xalo Heso jî li Elezîzê Meslek Lîsesî xelas kiriye û hatiye Anqerê ku unîversîtê bixwîne. Heso û Ferîd di xaniyekî xwendevanan da dimînin. Beriya ku Memehed were Anqerê bi qîza apê Ahmedê Îbo, Sakîneyê re dizewice û tev tên Anqerê. Xalo Mehemed û Abla Sakîne li Bîtpazariyê, li Mehela Îtfaiyê xaniyekî axşab kirê dikin û Heso û Ferîd digrin ba xwe. Xaniyê wan du qat e, li qatê ewilî banyo, tuwalet û du ode, li qatê jor jî mitbax û odeyek heye.

Demek şûnda, lawê xalê Miçoyê Ebasê Zilkif, ji xalo Ferîd wan re nameyeke dûr û dirêj dinivîsîne. Dixwaze xalo Ferîd di xaniyê xwe de cîh bide wî. Abla Sakîne dibêje "Bila ew jî bê, em ê hevdu îdare bikin." Herwiha Zilkîf jî tê û di xanî de bi cî dibe.

Abla Sakîne dibe dayika wan, kincên wan, şîva wan, feraqên wan, paqijiya malê, bi kurtasî kar û barên malê lê ser milê Sakîneyê ye. Kêfa xalo Heso ji xwendinê re nayê, dixwaze karekî bike bes cangiraniyê dike, li kar nagere, xalo Mehemed bi

zor û bela wî dibe "Devlet Demir Yollari" û li wir wî wek elektrîkçî dixe kar. Xalê min Hesen ji wî karî emeklî dibe û li Anqerê dimîne.

Xalo Ferîd 1967an de lîseyê xelas dike û dikeve Unîversîta Teknîkê ya Rojhilata Navîn (ODTÜ) û ji wir derbasî Fakulta Ziraetê dibe, ciyê fakultê li Dişkapiyê ye, sal 1968an e.

Di nava keçikên xwendevanan da Ruhsar jî heye, Ruhsar û Ferîd dikevin yek grûbî.

Di warê siyasî de bihareke rengîn daketiye ser dinê. Şerê azadî û serbilindiyê, biratî û azadiyê ji Vîetnamê, Afrîqayê, Ewrûpa û Asyayê ba û bîna biharê belayî erd û ezmanan dike. Efendî, beg û axayên zilm û zorê wek pelên spîndarê li ber vî bayê xweşik dilerizin. Di bin esmanê biharê de bilûrên şivanan musîka eşqa dilê xortan dilorîne, eşqên herî pak û zelal, eşqên herî xweşik û giran di vê biharê de çêdibin, bihar wek laleyên zer û sor dilê însanan dixemilînin. Ji Başûrê Kurdistanê pêşmerge, wek Ferîd di helbesta xwe de dibêjê, derketiye serê çiya, bayê azadî û serfiraziyê li nav welat belav dike. Xwendevanên kurd ên li metropolan bi guhekî guhdariya dinê dikin û bi guhê din jî guhdariya pêşmergeyan dikin.

Ferîd aşiq dibe. Li mektebê sala wî ya pêşîn e.

Tayîna xalo Mehemed derdikeve Çorumê, ew bar dikin diçin, bes Ferîd, Zilkîf û xalo Hesen carna cilên xwe yên qirêj dibin ba abla Sakîneyê. Abla Sakîne cilan dişo, utî dike û ji wan re dişîne.

Ferîd rojekê ji abla Sakîne re dibêje, "Ez aşiq bûme, ka were keçika min bibîne." Abla Sakîne bi Ferîd re diçe Fakulteya Ziraetê, keçika ku Ferîd aşiqî wê bûye Ruhsar e, li baxçê mektebê runiştiye. Ferîd wê bi tiliya xwe nîşanî abla Sakîne dide. Abla Sakîne li

Ruhsarê dinêre, keçik xasek e, dikeve serê Sakîneyê. Ji Ferîd re dibêje, "Keçika te xasek e." Diçin ba Ruhsarê û halê hev dipirsin.

Gava Ferîd li Anqerê Zîraetê dixwîne DDKO ava bûye. Hin xortên xwendevan û pêşverû di nav DDKOyê de ciyê xwe digrin, ji aliyekî mekteba xwe dixwînin û ji aliyekî din kar û barên xwe yên komeleyê dom dikin. Ferîd di nav kar û barê wê komelê de ciyê xwe digre, tembûrê lê dixe, govendê digre û di karê rojane de pêwîstiyên xwe tîne cîh. Komela wan kulturî ye, bes kar û barên dikeve ser milê wan, hem giran û hem jî siyasî ye. Analîz, teorî û perspektîfên li wir çêdibin hem li ser nivşê wan hem jî li ser nivşên li dû wan tesîrekî mezin çêdike. Çepên Tirkiyê wek niha wê gavê jî tifinga xwe ya zengarî û gemarî derdixin û gulleyan dibarînin ser wan de. Yên gotina kurd dibêjin, "Milliyetçî ne û wê Tirkiyê ji hev bixînin."

Tirkiye li hev ketiye, xwendevan li her derên Tirkiyê rabûne ser xwe, eşqa şoreşê, qehremanî, serbilindî û serfirazî rê li wan şaş kiriye, yê ku demançeyekê û tifingekê dixe destê xwe, dest bi şoreşê dike. Hinek xortên kurd di nav wê şoreşa xwendevanên tirkan de cî digrin û wenda dibin.

DDKO di nav şoreşek dinê de ye: Kurd hene an tunene? Şoreşa DDKO ev e. Divê li gel xelkên Tirkiyê bidin qebûlkirin ku kurd hene.

Ji bo Ferîd demeke nû, demeke xweşik û demeke bi zehmet û zor dest pê kiriye. Hêviyên wî, hesreta wî ya rojên pêşin ji her tiştî pêşdetir û bilindtir e. Eşqa wî û Ruhsarê jî di bin wê dara hesretê de hêşîn û mezin dibe.

Ji bo edalet, heq û huqûq xebat kirin ne hêsa ye. Hele li welatekî wek Tirkiyê qet ne hêsa ye, herî bêtir ji bo mafên kurdan

xebat kirin e. Wek tu xwe bavêjî nav agirê cahnimê, ne tenê dagirker, hêzên ku hay û bayê te jê tune, dibin dijminê te, dibin celadê ruh û canê te. Divê hem ruhê te û hem jî canê te bigrin. Hevalên te yên bav û kalan, nasê te, hemwelatiyên te jî dikarin bibin dijminê te. Tarîxa me şahîda wê ye. Bê hejmar kurd hatine kuştin, xaîntî û xiyanetek bê sinor li erd û ezmanên me heta niha hukmê xwe ajotiye. Gotina min ew e ku di rûpelên pêşî de em dibînin ku yên derbên xwe yên zalim li ser Ferîd dibarînin, cardin zarokên vî welatê me ne. Yên demançe dane destê wan, yên nan û av dane wan, yên ew veşartine jî bê guman kurd in.

Yek caran ez xeyalan dikim, ez hêvî dikim ku kurd wê rojekê ji bo xwe, ji bo zarokên xwe jiyaneke însanî ava bikin, jiyaneke bê mêrkujî, bê hesûdî, bê durûtî û dûvikî. Hevdu kuştin dê qedexe bibe, kurdek dê kurdekî nekuje. Kes li kesî tade û zulmê neke, neheqî û bêbextî, mêrkujî, dizî, divê bibe şerm û rûreşî. Bira zarokên me, ne di bin dara mirinê de, bin dara jiyanê de bilîzin û mezin bin. Bira bilûrên şivanên me ne kilamên mêrkujan, kilamên eşq û dilovaniyê bilorînin. Evana xeyalên min in û ez wisa bawer im ku xeyalên Ferîd jî wisa bûn. Di kilam û helbestên Ferîd de, ne axa û beg û ne jî mêrkuj û eşîr hebûn, kilamên wî kilamên gundî û cotkarên me bûn, kilamên xelkê reben bûn, lorîkên dayikan bûn.

Kilamên wî, hesreta dilê wî, bûn mirina wî.

Hêzên ku ji van kilaman hez nedikirin, rabûn gulle li xwediyê kilaman barandin.

Min bi saya serê hevalê delal Sîno Xurşîd du helbestên Ferîd peyda kirin. Ez wan her du helbestan li jêr dinivîsim.

## *Pêşmerge*

*Tenê bû, rabû ser piya*
*Hêla rastê çiya, çepê çiya*
*Rakir ala rengîn qîrya*
*Deng veda, deng veda, deng veda*
*Deşt û zozan û çiya naliya, naliya*
*Gîhîşt geliya*
*Gundî, karkêr, pale û zana*
*Rabûn giryan, rûniştin giryan*
*Ban kirin keç û bav û diyan*
*Civiyan ser hev, dest dan destên hev*
*Pişt dan pişta hev*
*Qîrîn û hawar dan hev*
*Hemî bûn yek dev*
*Qor bi qor, rêz bi rêz*
*Çûûûûn çûn li dor pêşmerge yek bûn.*
*Bijîn, bijîn, her bijîn hûn*
*Deh, sed, hezar, sed hezar*

*Zar û zêç, keç, qutabî, dersdar*
*Li hember gihîştin faşîstên har*
*Tev bûne wek dîwar*
*Metirsin, metirsin êdî şer nabe sar*
*Ji Xaneqîn heta Şeqlawa*
*Herêm, herêm, cî bi cî*
*Welatê kurda*
*Ketiye bin destê pêşmerge, neviyên Kawa*
*Dehaqê rûreş, bapîrê Baasiya*
*Wê rojê lêdan bavê pêşmerge Kawa*
*Berê Newroz tenê bû cejna kurda*
*Lê îro pêşmerge hergav, herdem*
*Ava dike cejna*
*Pîroz be, pîroz be, li te Kurdistan*
*Ey pêşmerge.*
*Çi bêjim hindik e ji te ra*
*Deşt, zozan, çiya hemû*
*Ji te ra bûye derge*
*Bijîn, her bijîn hûn pêşmerge.*

## *Kevokên Spî*

*Kevokên spî, kevokên spî*
*dê bên firandin*
*Xerîtên kevin, xerîtên kevin*
*dê bên çirandin*
*Cahş û mahş, cahş û mahş dê bên bakirin*
*Kurdistan, Kurdistan dê bê ..........*
*Belê belê .... ...... niha ji bo me ye*
*......... ......... .... diya me heye*
*Bav, ........., çel û pel .........*
*Deşt û zozan, çiyayê Kurdistanê ê me ye*
*Me qîrîn û hawar daniye dîlan*
*Bûka me, bûka me Kurdistan*
*Deng bidin hev, gazî kin hevalan*
*Bira rakin topan, bira rakin çekan*
*Bira hespên xwe rakin ser piyan*
*Kêm mekevin, kêm mekevin*
*Ha xortên dilovan*

*Dem bi dem gav bi gav*
*Werin, werin, werin ha werin*
*Dewran, dewran ji bo ê şerên*
*Ê ku têkoşîna doza xwe nekin ker in*
*Herin, herin heta Bexdayê herin*
*Bînin, bînin serê Hesen el-Bekir bînin*
*Segbav Husên, segbav Husên*
*Bîr mekin, ha bîr mekin!*
*Warên wan, warên wan*
*Bi ser wanda hilweşînin*
*Erd û ezman, erd û ezman*
*Bi ser wan da bireşînin*
*Heyfa Leyla; çira Kurdistanê*
*Bistînin ha bistînin.*

## Evîna Ferîd û Ruhsarê

Ferîd û Ruhsar di salekê de dikevin Fakulta Ziraetê, dewra wan dewra 1968an e. Ferîd û Ruhsar dikevin yek grubê. Ji rojan rojekê divê hemû xwendevan wêneyên xwe bikşînin, Ferîd di nava gruba xwe de ji Ruhsarê dipirse ka ew dikarin rismê xwe tev bikşînin. Ruhsar dibêje baş e. Wê rojê wêneyên xwe dikşînin.

Tu nabê Ferîd bê xebera Ruhsarê bûye aşiq. Ew radibe wêneyekê digre, dixe nav zerfekê û nameyekê jî dişînê Swêregê ji Apê Sefo re. Gava nama Ferîd dikeve destê Apê Sefo êdî qiyamet radibe, qiyametek wisa ku erd û ezman li hev dikeve. Aşiqê dîn û sûtal, ewladê bê xêr, Ferîdê ne eşîr, Ferîdê eyarsîr radibe dibe aşiqê keçikek xerîb, keçikek ku esl û feslê wê ne belî ye, mirov vê yekê li bavê xwe dike, mirov vê rûreşiyê tîne serê Apê Seferê Qado? Dost û nas ê çi bibêjin? Em ê çi xweliyê li serê xwe kin?

Ferîd, Ferîdê evîndar, asiqê dîn û perwane li ser ezmanan difire, qarîn û qîrîna Apê Sefo ji guhekî dikeve hundir ji guhê din derdikeve der.

Dewran diguhere, dewranek nuh, dewranek xweşik û bê sînor wek gulên sor siya xwe avitiye ser nivşên nuh, eşîr û eşîrtiyê berê xwe daye ber bi rojavayê ve diçe.

Apê Sefoyê ku aqildar û pêşverû ye wê guhertinê ferq nake, nabîne ku dara dewranê her tim ciyê siya xwe diguherîne. Ji ber vê yekê erd û ezmanan li hev dixe. Şewketê Apê Mizûr, pismamê Apê Sefo, diçe mala Apê Sefo û wî sakîn dike. Dibê, "Sefo qiyametê rameke! Binêre, tu jî aşiqê Xodê bûbûy, keçika koçeran Xodê, aqil û heşê te ji serê te biribû, dê û bavê te, mirovên te hember derket. Tu û Xodê negîhîştin mirazê xwe. Niha tu çima pêşiya vî lawikî digrî?" Şewket, Apê Sefo dixe nav kuça teng, çare li Apê Sefo namîne. Bê çare û bê dil ji kera xwe dadikeve jêr.

Min berê gotibû, Ferîd Ruhsarê nîşanî Sakînê jî dide, Sakîne dibêje gelek baş e. Herwiha di merhala dawiyê de malbata Ferîd dibêje erê, bes feqîra Ruhsar hay û bayê wê ji tiştekî tune. Ferîd car bi car diçe mala diya Ruhsarê, Ruhsar li mala diya xwe dimîne, bes Ruhsar Ferîd wek hevalekî xwe dibîne, hevalekî mektebê, ne kêm ne zêde.

Gava Apê Sefo jî dibê erê, edî Ferîd ji kêfan wek çûçikekî azad difire. Xwe dilezîne ba Ruhsarê, dibêje ez dixwazim bi te re bizewicim. Ruhsar mat dimîne, heş û aqil ji serê wê diçe, nizane çi bibêje. Heta wê deqîqê wê bi çavê hevaltiyê li Ferîd nihêrtiye, heta wê gavê qet zewac nayê bîra wê. Her duyan nû dest bi mektebê kirine, li pêş wan riyeke dûr û dirêj heye, ziman li dêv kilît dibe, dibêje "Ferîd, divê ez bi diya xwe re bipeyivim."

Bavê Ruhsarê tune, gava Ruhsar zaro ye ew di qezayekê de wefat dike. Bavê wê mutehît e, di mintiqa Xarpêtê de bi qamyona

xwe li ciyê înşaatê kar dike. Gava tekerê qamyonê dikeve çalekê, bavê wê ji qamyonê dikeve û wefat dike. Ruhsar wê demê li der dora sê sal û nîva ye.

1978an de, li Swêregê wê delaliyê xwe winda bike. Qîza wî Yekbûn sê sal û nîv e. Ew jî li Kurdistanê bavê xwe winda dike.

Latîfe xanim Ferîd baş nas dike, Ferîd diçe mala wan û tê. Ruhsar dibêje dayê, "Ferîd ji min ra wisa dibêje ez çawa bikim?" Diya wê peyva xwe dirêj nake, dibêje "Qîza min Ferîd lawikekî baş û delal e, ew kurd e, bes yê giring ew însanekî baş e. Ji bo min problemek tune."

Ferîd û Ruhsar dergîstî dibin. Hevalê Ruhsarê Ferîd, carekê de dibe dergîstiya wê, eşqa dilê Ferîd li dilê Ruhsarê stêrkên ezmanan vêdixîne, Ruhsar jî ne bi dilekî bi deh dilan aşiqî Ferîd dibe. Li ser giyayên êşîn û xweşik, di nav kulîlkên sor û zer de govendek li dar dikeve, Ferîd û Ruhsar di serê govendê de ciyê xwe digrin, şev û rojên wan dibe govendeke xweş û rengîn, govenda eşqa dilan, dilên serxoş, pak û delal, govendek bê serî û bê binî, dawiya wê nayê.

Lê rojên pêş yên ji şahî û şadiyê hez nakin, ew ê wan ji hev biqetînin, bes govenda dilê wan tu caran nasekine. Heta roja ku zewaca xwe bikin gelek sal derbas dibin û gelek mecmele tên serê wan, bes govenda wan dom dike.

# Hefs û dawet

Ji êvaran êvarek, ji mehan meha adarê ye, serma û seqema zivistanê dom dike, tariya êvarê, dux û dûmana seyaran, qalorîferan, sobeyan û fabrîqan wek çarşefa reş daketiye ser Anqerê. Ruhsar, Ferîd û diya Ruhsar Latife xanim li dora masê şîva êvarê dixwin. Çavên wan li xwarinê, guhên wan li radyoyê ye. Di 12 Adarê de leşkera ixtidar girtine destê xwe, rojên pêş wê çi bibe kes nizane. Spikerê radyoyê navan dijmêre, yên navên wan tên hejmartin divê biçin xwe teslîmî polîs bikin. Navê Ferîd jî di nav wan de ye. Pariyê wan di qirika wan de dimîne.

Ferîd dikeve hefsê, Deniz Gezmiş û hevalên wan tên îdamkirin, welatperwerên çep û rast li Diyarbekîrê tên berev kirin. Li ser rêya Seyrantepê bereqa eskeran dibe girtîgeha kurdperwerên rast û çep. Yên "bi sûc" û yên "bê sûc" li wir tên berhevkirin. Di nav wan de Ferîd jî heye. Car bi car ez bi diya xwe re diçim ziyareta Ferîd. Kêfa wî li cî xuya dike, gava ew û diya min qise dikin ez jî li girtiyên dina temaşe dikim, li ber qawişê hewşa wan heye, ji xwe re piyase dikin. Di navbera ziyaretvan û girtiyan de tenê têlên bi dirik hene, bi hêsatî em

dikarin wan bibînin. Her caran ku em ji Ferîd vediqetin, êdî ez wî ji bîr dikim û bi xeyalên xwe mijûl dibim. Xeyalên min, eşqa min, heye tune futbol e. Bi futbolê ve dijim, bi futbolê ve radizim û bi futbolê ve radibim. Bes ferqa girtiyên Diyarbekîrê û girtiyên hefsên normal li mijiyê xwe qeyd dikim. Ji ber ku zarotiya min pir caran li rêya hefsa Swêregê derbas dibe. Bavê min ji qebedayên Swêregê yek e, lingekî wî li derve ye û lingekî wî jî li hefsê ye, gava kesek tunebe ku pêre lec bike, dikeve yaxa polîsekî an sîleyekê li wî dixe yan jî qumçên unîforma wî jê dike û dikeve hefsê. Ez û birayê min jî her êvar jê re xwarin dibin hefsê. Em girtiyên wir nas dikin û dibînin, halê wan, rabûn û runistina wan û girtiyên Diyarbekîrê pir cihê ye an jî ji min ra wisa tê. Yên Diyarbekîrê serbilindî nîşan didin, meşa wan, peyvên wan babetek dinê ye, wek li ser çiyayekî bilind rûnistine û temaseyî dinê dikin, li hember qerdiyana destên xwe li hev girênadin, ji qerdiyanan re efendî nabêjin. Hember qerdiyanan serbilind disekinin. Ji wan rojan ev risim di mijûyê min de ciyê xwe digre.

Ranza Ferîd û Îhsan Yavuzturk li kêleka hev in, hevaltiya wan pir baş e, nêzîkî hev in. Ji rojan rojekê pismamê min Mehemed jî tînin hefsê. Ferîd li Mehemed xwedî derdikeve, jê re cî çê dike. Îhsan ranza xwe dide Mehemed, êdî Ferîd û Mehemed li kêleka hev radizên. Mehemed dibe xwendevan, Ferîd dibe mamoste. Ferîd di warê ziman de gor heval û dostên xwe yên hefsê pir pêşde ye, dikare kurdî bixwîne, binivîsîne. Siiran, kurteçîrokan dinivîsîne, kilaman dibêje, kilaman dinivîsîne.

Di nava girtiyan de yê herî ciwan Mehemed e, 17 salî ye û yên herî pîr Xelîl Axayê şirnexî ye, salê wî jî 75 e. Xalê Xelîl Çîçek kurdperwerekî baş e, ji Mele Mistefa Barzanî re şekir, ard,

rûn şandiye, ji ber wî yekê ew jî avêtine hefsê. piraniya hevalên Ferîd ê hefsê, ji yê herî ciwan heta yê herî pîr, bê yek-du kesan hemû ji Ferîd hez dikin, qedir û qîmeta wî dizanin. Ferîd bi hunerê xwe, bi enerjî û dilsoziya xwe, bi kurdperwerya xwe di dilên dost û hevalên xwe de ciyekî taybetî digre. Bi ziman û saza xwe, bi kilam û kurteçîrokên xwe, bi şexsiyeta xwe ya kurd û modern di nava nivşên kevn û nû de piran ava dike, bi rabûn û rûnişkandina xwe, bi jiyana xwe ya rojane ji bo rojên pêş dibe ronahiya şevên tarî.

Ger ez bibêjim di her tiliyê Ferîd de hunerek hebû, ne mubalaxe ye. Ferîd mekteb xwendin hez dikir, bi gotinek dinê, ji hînbûnê hez dikir, tiştên ku ji vî meraqa wî xelas dibûn pêr kim bûn.

Di warê matamatîkê de jîr bû, gava problemek zor derdiket pêş wî, heta ku wî ew problema hel nekira dev jê ber nedida. Gava min nikarîba dersên xwe yên matamatîkê çêbikirana, ez diçûm ba wî, bi sebir alîkariya min dikir û dixwest ku ez fam bikim ku ew problema çawa çareser dibe.

Futbolciyekî baş e, li Anqerê dibe qelebanê Demir Sporê. Havinekê li Swêregê dibe qelebanê Swêreg Sporê, wek qelebanê mêvan di taximê de cî digre. Di wê maçê de ez û çend heval li kêleka qeleyê rûdinin û temaşeyî wî dikin. Wek pisîkê sivik û çapik e, li hewayê difire, ji refleksên wî re heyran dimînim. Ez bawer dikim di nav merivên me da yê herî pêşî futbolê dilîze, birayê Ferîd, xalê minê Hesen e, dû ra Ferîd dest bi futbolê dike. Gava Ferîd li Demir Sporê dilîze, ez û pismamê min Mehemed jî li Swêregê futbolê dilîzin. Navê taxima Mehemed “Qertel Spor”, navê taxima me jî “Şahîn Spor” e. Rengê wan sor û reş e, yê me jî kesk sor û zer e, uniformayên me rengareng in, bi cilên pîrekên

Qerecdaxê dimînin, her babet reng tê de heye. Gava em bi wan ra maçê dikin ew zora me dibin, em jî dest bi teşqelê dikin.

Di hewşa hefsa Diyarbekîrê de, Ferîd, Mehemed, Mehmûd Kiper, Mehmet Tuysuz ji bo kêfê car bi car topê lox dikin. Menecerê wan abûqat Bahattin Eryilmaz e, wî jî kovarek bi navê Sêrsuvar derxistiye, di warê kurdperweriyê de weşan kiriye, ji ber vê yekê ew jî avêtine hundir. Her cara ku Ferîd û hevalên wî hunera xwe ya futbolê nîşan didin, Bahattin jî, wan bi qedayif û baqleve gur dike. Dibêje, ger hûn baş bilîzin, ji qantînê dilê we çi bixwaze ez ê bidim hanîn.

Di warê musikê de, bi taybetî Ferîd bi Nûrî ve tev pir dixebite. Piştî hefsîbûyîna 71an ew û Nûrî bi musika kurdî kasetan çêdikin. Nûrî hevalekî hêja û delal e, ji Wêranşarê ye. Gava Ferîd di nava Kawayê de cî digre, Nûrî jî wek min di nav refên DDKDê de kar dike. Beriya çêbûna grûban Nûrî û Ferîd pir nêzîkî hev in, tiştê wan tîne ba hev dengbêjî, meraqa edebiyatê û zimanê kurdî ye, bi taybet şiîrên Cîgerxwîn, kilamên Mehemed Şêxo ne. Nûrî gava kilamên kurdî dibêje por li ser serê min pîjpîjî dibe. Dema Ferîd û Nûrî tên ba hev êdî her du per bi xwe ve dikin û bi ezmanan dikevin, dinyaya li dora xwe ji bîr ve dikin, li dora wan kî çi dibêje, bo çi dibêje nagîhîje guhên wan. Ferîd li sazê dixe û Nûrî dest dibe ber guhê xwe. Yekcaran hinek kilaman tevde dibêjin, wê gavê jiyana hesûdî, xeybet, nifaq, birakujî, mêrkujî, derew û dolabên rojane ji bo çend deqiqeyan be jî li ber çavên min winda dibin. Bîhn û bayê biharê dadikeve ser min, baraneke xweş û nerm dest pê dike, ava baranê bîhn û buxa erq û lexeman dixe ber xwe û dibe ciyekî dûr. Ew çend deqîqeyên bi sihêr, dibe bihareke dûr û dirêj. Yên li wan kilaman

guhdarî dikin wek di nav wê deqîqeyê de bibin însanekî din, ruh dikeve çavên wan, bîhna wan fire, ruhê wan aza dibe.

Ferîd ji ber vê yekê di tarîxa me da ciyekî taybet digre. Bi kar û barê xwe yên şoreşgerî, mejiyê me, bi saza xwe jî dixwaze ruhê me aza dike. Dixwaze ruhê ku bi hezar salan e tê perçiqandin, pelixandin, ruhê ku roj bi roj dirizin, ruhê ku bi hesûdî, bi dijminatî, bi nezantî bûne wek qetrana reş aza bike, wî ruhî ji bin nîrê gayî xelas bike.

Ruhê me li zencîran ketiye, mejiyê me, dest û lingên me li zencîran xistine, sibê heta evarê tiştê em li ser difikirin, tiştê em li ser galgalan dikin hîle ye, firildaq e, hevxapandin e, bîr û mezelê hev kolan e. Kî mezelê kî herî baş bikole ji wî re dibêjin, ew peyakî xurt û egîd e, camêrekî şerkir e. Wisa tê fikirandin wisa tê gotin. Jiyana ku li serê me hatiye gerandin ev e. Û ev jiyan hem bi zencîrên xuya dike û hem jî bi zencîrên ku xuya nake, wek fistanekî dînan li me kirine.

Ferîd di merhaleyeke wisa de diçe ber vê zencîrê, bi saz û kilamên xwe, bi zimanê xwe yê bav û kalan, bi serwextiya xwe dibêje, "Ev e! Ev xeleka ku ez bi tiliya xwe nîşan dikim, xeleka herî zeîf û sist e, destê xwe bavên vê xelekê, ew zencîra ku bi hesinê pola çêbûye, ew zencîra ku bi hezar salan ruhê we, dest û lingên we girêdaye wê ji hev de bikeve, wê perçe perçe be, wê hûrhûrî bibe, wê bibe toz û dûman û bikeve ber bayê biharê..."

Xeleka ku Ferîd nîşan dide ziman e. Ferîd zimanê me yê ku bi hezar salan e xistine heft qat binê erdê, ew bi pênûsa xwe, bi kilamê xwe, bi şiîr û kurteçîrokên xwe santîm bi santîm ji binê erdê derdixe, gend û gemara hezar salan bi devê xwe puf dike û pak dike. Mezinbûna Ferîd ev e.

Ez hêvî dikim ku ev gotinên min çewt neyên famkirin. Ez dirokê înkar nakim û dirokê bi Ferîd ve jî dest pê nakim. Erdê ku Ferîd li ser disekine, erdekî vik û vala nîn e, li ser vî erdî beriya ku Ferîd ji diya xwe bibe, kurdî tê peyivandin, kurdî tê nivîsandin, bi kurdî kilam û şiîr tên gotin. Gava Ferîd helbesta dinivîsîne, di bin serê wî de dîwanên Cîgerxwîn hene. Bes di nav nivşê me de, nivşê me yê ku dixwaze milletê kurd wek hemû milletan bibe xwediyê jiyaneke însanî û serfiraz, Ferîd ciyekî taybet û giran digre.

Millet kurdî dipeyive lê belê em li ser siyasetê bi tirkî dipeyivin; semîner, mitîng, civîn û munaqeşeyên me bi zimanê tirkî ne, heta em di nav xwe de jî tirkî dipeyivin. Literatura çepê kurd tirkî ye. 27 sal piştî Ferîd, ev literatur hîna jî bi zimanê tirkî ye, gelek însanên ku ji sibê heta êvarî xelkê azad dikin, hîna kurdî nizanin, dibe ku di jiyana xwe de carekê jî bi sê gundiyan re rûneniştine û neketîne nav sohbetekê.

Endamên DDKOyê gava derdikevin ber mahkemeyê, korregirêka herî girîng tunebûna kurda ye. Îdeolojiya resmî bi devê dozgerê mahkemê vê dibêje "Kurd tunene! Yên ku ji xwe ra dibêjin kurd di eslê xwe da tirk in."

Endamên DDKOyê hebûna kurdan, bi hebûna xwe, bi zimanê xwe yê dê û bavan, bi tarîxa xwe, vê iddîayê pûç dikin. Di warê delîlan de tiştê ku bi giranî dajon pêş mehkemeyê zimanê kurdî bi xwe ye.

Endamên DDKOyê xwe diparêzin an jî divê em wisa bibêjin, endamê DDKOyê li hember iddîanameya dozger hebûna kurdan, hebûna zimanê kurdî diparêzin. Di dîroka modern a Tirkiyê de xwendevanên kurd, pêşverû û ronakbîrên kurd bi serwextî, bi cesaret û serfirazî li dijî îdeolojiya resmî radibin ser piyan.

Bi cesareteke medenî û bi rêyeke ilmî iddianameya dozger dikin binê erdê, tiştên ku di iddianamê de cî girtine, yekayek ji hevdu dixin. Îdeolojiya resmî, di huzûra xelkê kurd û tirk da deşîfre dikin. Bes mahkeme di îdeolojiya resmî de israr dike. Endamên DDKOyê ceza digrin. Cezaya herî bilind 16 sal e, Ferîd xwe baş diparêze, 14 sal ceza didin wî jî.

Sala ku Ferîd ji hefsê tê berdan partiya Ecevît li ser hukim e. Ecevît 1974an da Qibrîsê, wek zebeşê Diyarbekîrê ji navê de diqelişîne, Qibrîs dibe du perçe; perça yunaniya û perça tirka. Cûntaya yunanî ji iqtîdarê dikeve, demokrasî tê Yunanîstanê, li Tirkiyeyê Ecevît dibe qehreman, qehremanê demoqrasiyê. Piştî dagîrkirina Qibrîsê Ecevît efûyekê derdixe, girtiyên siyasî jî dikevin ber efûyê, Ferîd û hevalên wî yên kurdperwer ji hefsa eskerî ya li Diyarbekîrê tên berdan.

Ferîd bi def û niqaran digihîje Swêregê. Ruhsar li gel Ferîd e, piştî sê sal û nîvan, hesreta roj û şevan xelas dibe, apê Sefo dibêje fersend ev fersend e, em ê daweteke bikin du dawet, bira reqîna def û zurnê gur bibe.

Ferîd û Ruhsarê wek suwariyên hespên gewr û boz bi zeman re ketine xarê, divê hespa zemên bi qefilînin, dive serî jê bistînin, divê ne li paş, li pêş zemên bijîn, deqîqeyên, saetên, roj û salên ku winda bûne divê vegerin, divê Ferîd û Ruhsar wê zemanê wek ava kûzê hûnik bi ser xwe da bikin û vexwin.

Wek apê Sefo dikin, dawetek dibe du dawet, telgrafekê ji Latîfe xanimê re dişînin, Latîfe xanim û birayê Ruhsarê Erhan zû bi zû didin rê.

Dawetek xweş û giran li mala Sefoyê apê Qado li dar dikeve. Mehmûdê Kaloyê Aresî bi cil û cawên folklorî serê govendê

dikşîne, Ferîd li kêleka hewzê rûniştiye, pismamê min Alo wî traş dike. Kêfa apê Sefo li cî ye, destên wî li paş wî, li nava dawetê qolaçan dike, bi henek û qisên xwe kêfa mêvanan xweş dike. şayiyeke wisa daketiye ku kes kesî nabîne, zarokek ji ser xanî dikeve hewşa kalikê min ê Husên, bes tiştek nabe. Meriva min Zozanê, wê gavê zaro ye, niha xatûna pismamê min Mehemed e, dikeve nav bîrê. Bes ew jî difilite, tiştek nabe. Herwiha piştî demeke dûr û dirêj, Ferîd û Ruhsarê bi kêf û şayî digihîjin mirazê xwe û dibin jin û mêr.

Li gor diya min di nav vê kêf û şayiyê de jan li xalo Mehemed radibe. Hundirê wî jan dike. Apê Sefo sibê zû radibe diçe doxtorek tîne. Doxtor derziyekê li Mehemed dixe, jana wî disekine. Doxtor dibêje wî bibin Diyarbekîrê, li bajarê Swêregê nexweşxane tuneye. Na, nexweşxane heye, doxtor tunene, alet tunene, derman tuneye. Ji ber vê yekê gava meriv nexweş dibe divê biçe Diyarbekîrê, ger perê meriv hebe meriv diçe Diyarbekîrê an jî li mala xwe, li ber çavên zarokên xwe dihele û dimire. Herwiha Mehemed radikin Diyarbekîrê, doxtorên wir ne dibêjin erê û ne dibêjin na, radibin Mehemed emeliyet dikin. Diya min, pîrika min û Ferîd diçin ziyareta wî. Mehemed di nav ciyê xwe da digirî, deng nake. Hêsrên çavan bi ser riyê wî da dadikevin jêr. Devê xwe vedike, dixwaze tiştekî bibêje, nikare, dev tê girtin. Çavên xwe yên qahwerengîn vedike li diya xwe, birayê xwe û xwunga xwe dinêre, melûl û bê çare ye.

Adîle, torina meta Zuloyê Cana, cîranê xalo Mehemed, dostê bav û kalan li nexweşxanê hemşîre ye, diya min ji Adîlê rewşa Mehemed pirs dike, Adîle dibêje wele ez nizanim çî ye? Ji canê wî sê parçe girtin û şandin tahlîlê. Ji Mehemed ra nebêjin, mixabin ew qansêr e.

Piştî emeliyetê Mehemed piçek rind dibe, bi xêra dermana rind û qelaw dibe, xwe berhevî serhev dike. Pir najo cardin dikeve. Ferîd wî dibe Swêdê. Lê balafirgeha Swêdî wan radiwestînin, li wir Ferîd digrin û dixin nezaretê. Kaxizê wan kêm e an kêmasiyeke wan heye. Nîmet, birayê Necmedîn Buyukkaya vir de wir de baz dide û kêmasiyan temam dike û Mehemed digîhîne ba doxtor. Çare nîn e! Bersîva doxtor ne dirêj e, kurt û rast dibêje, divê hûn wî rojekê pêş bibin malê, zêde wexta wî nemaye.

Ferîd birayê xwe tîne mal, wî dikin nav ciya, li hewşê, li bin mêwa tiriyê dirêj dikin. Mehemed roj bi roj dihele, bi gotina diya min ne ji mahran re dimîne û ne jî ji mişkan re. Di nav ciyê xwe da, wek berfa ber tîrijên tava biharê dihele, porê wî diwese, hestiyên wî biçûk û zirav dibin. Hundirê wî wekê agir vêketiye, bi lepa cemedê dixwe, fêde nake, agir venamire. Mehemed li ber çav û destên Ferîd dihele û diçe gorê.

Qehra dilê Ferîd giran e, parçeyek ji canê wî, ji ruhê wî winda dibe. Birayê delal, birayê henekvan û kêfxweş Ferîd tenê dihêle.

Ruhsar û Ferîd vedigerin Anqerê, Ferîd dest bi mekteba xwe dike. heta mekteb xelas dibe Ferîd û Ruhsar li mala Latîfe xanimê dimînin.

Heta 1974an ez topê dilîzim, lingê minê rastê dişkê, ez topê berdidim. Lingê min li nav alçiyê, ez li mal veketî me, qaptanê min, hevalê hêja Mustefa ji min re "Tiriyên Xezebê" û Ahmedê pismamê min jî kitaban tîne ji min re û mala min dişewitînin! Saya wan da ez jî dikevim ber bayê biharê. Ji wê rojê heta niha min û Mustefa me hevdu nediye. Mustefa û Ahmed ciyê xwe li nav dilê min girtine û wê wiha dom bike.

Ez dikevim mekteba Teknîkê ya mêran, roja ku ez ê dest bi mektebê bikim mamostê me dibêje, divê hûn cilên xwe yên atelyeyê bi perê xwe bikirin. Ez gelek aciz dibim û dev ji mektebê berdidim. Demek şûn da ez dikevim Tapû Kadastroyê. Bi çend hevalên Swêregî ez dest bi Tapû Kadastroyê dikim. Em berê li yurda Sêrtê dimînin, pişt re em derbasî xaniyê ku Ahmed tê de dimîne dibin. Ahmed merivê min û Ferîd e, pîrika Ahmed û kalikê min xwung û birayên hev in, wek bavê me li me muamele dike, kêfa me jê re tê, ez bawer dikim kêfa wî jî ji me ra tê. Sibê heta êvarê cixaran dikşîne, gava ji xewê radibe, taştêya xwe bi cixareke qaçax dest pê dike, taştêya wî cixare ye, demekê şûn da ji qanserê wefat dike.

22ê meha qasimê de gava gulle li Ferîd tên barandin û xebera reş digîhîje Anqerê, di nava ewên ku xwe davên otobosê û diçin Swêregê Ahmed jî heye, heta mirina xwe ji Ferîd hez kir, qîmet û hurmeteke mezin nişanî Ferîd dide. Xwedê bi rehma xwe şa bike.

Li Anqerê her cara ku fersend çêdibe diçim ba Ferîd, pir caran ez û Ahmed tev diçin wir. Heta saetên dereng em rûdinin û sohbet dikin.

Li Anqerê DDKD ava bûye, nivşên nuh û kevn li nav wê komelê de kar û barê xwe tev dikin, ji wan yek jî Ferîd e, cara yekemîn li Anqerê di bin navê "Şeva Wêranşarê" de şevek çêdibe, di amadekirina vê şevê da Ferîd wezîfa xwe bêqusûr tîne cîh. Di nava demeke kin de du grûbên govendê ava dike. Her du grûb beşdarî şevê dibin. Wê gavê ez û pismamê min Misto Uzun û çend hevalên Swêregê em li "Siirt Yurdu" dimînin. Ez li otobusê siwar dibim û diçim Swêregê, niqarevan Remezan û zurnevan lawê Rizo digrim û tînim Anqerê.

Cara yekemîn di vê şevê de ewê kilamên kurdî bêne gotin, yê ku dê kilaman bibêje Şivan e, wê gavê nav û dengê Şivan tune, zêde kes wî nas nake. Li doraliya sahnê hevalên DDKDê ji laşê xwe bazinekê çêdikin. Qenaeta hevalan ew e ku gava Şivan bi kurdî kilaman bibêje, dê polîs wî bigrin. Hevalan jî biryar dane ku ewê Şivan teslîmî polîsan nekin, ji ber vê yekê li dora sahnê çemberek ava dibe. Herwiha şev bê qeza û bê bela xelas dibe.

Demeke tevlihev e, şerekî gur di navbera xwendevanên çep û ulkucuyan (Faşîstên tirk) de dom dike. Ji sibê heta êvarê gulleyan dibarînin ser hêzên çep, xwendevanên pêşverû de, çep di bin gullebarandinê de mekteba xwe dom dikin. Der û dorên unîversîtê û fakulteyan di navbera grûban de hatiye parvekirin. Her kes xwe di mintiqa xwe de diparêze, gava şoreşger diçin mektebê yek û yek newêrin, bi hev ra grûban çêdikin û wisa diçin mektebê. Dewlet temaşekar e.

Di nav DDKDê de munaqeşeyeke teorîk û îdeolojîk dest pê kiriye. Prensîbên komelê vedikin û munaqeşe dikin, bi saetan û bi rojan dipeyivin, dawiya munaqeşeyan nayê. Di warê fikran de cihêtî û yekîtiyên nû li vir tên çandin.

Di avakirina grûbên ku wê di rojên pêş de ava bibin, ev munaqeşeyên ha sedemeke giran û girîng dilîzin. Yên ku dê rojên pêş de hereketa Kawa ava bikin di nava van munaqeşeyan de ne. Welatperwerên di nava DDKOyê de erkê xwe yê herî girîng tînin cîh. Ev qenaeta min e. Kurd wek millet heye. Pêwestî ev e, di mahkeman de, di huzûra xelkê de ev bê îspatkirin.

Welatperwerên di nava DDKDê de û derveyî DDKDê de, gava duduyan davên, gava pêşîn DDKO avêtiye. Di merhela DDKDê de, ronakbîrên kurdan dixwazin rewşa kurdan tespît

bikin û li gor wê dermanek binivîsînin. Pêwistiyeke giran e, ji ber ku gava wext û saet temam bû ewê bi hezaran însanên me seferber bin, bi hezaran însanên me dê can û ruhê xwe amade bikin, ev ne lîstika zarokan e!

Li cîhanê deveyên (hêştir) qemer bi hev ketine, toz û talaza ku radikin ji Çînê heta Maçînê çavên her kesî kor dike, heşê wan ji serê wan digre. Her kes ji welatê xwe temaşayî vî şerî dike, her kes ji deveyekî re dibe alîkar, her kes kar û barê xwe ji bîr dike û alîkariya deveyan dike. Û deveyên qemer jî bi can û dil dixwazin ku her kes alîkarê wan be.

Baasî, serekên Baasiyan Hasan el-Bekir û Seddam, bi teyareyên Sovyetê, bi top û tanqên Sovyetê, bi efser û qilawuzên Sovyetî gava tevgera Barzanî, tevgera milletê me yê bindest bombardiman dikin, zarokên me, pîrekên me, xort û peyayên me li ber çavên me qetl dikin, em ji Sovyetê re li çepikan dixin û li kurdperwerên xwe jî naletê dibarînîn. Ji ber ku di çavê Sovyetê de Baasî li dijî emperyalîzmê ne, ji ber vê yekê Sovyet bi çek û leşkerên xwe ji Baasiyan ra alîkariyê dikin, em jî li kuçeyan dikin qarqar û dibêjin, "Bijî sîstema sosyalîst." Di nava vê rewşê de gelek xortên delal û pak ji bo vî şerî ziyan dibin, tên kuştin, birîndar dibin û dikevin hefsan, di nava hefsan û di bin erdê reş de dirizin.

Ferîd diçe komelê û tê, dikeve nav munaqeşeyan û mektaba xwe dom dike. Piştî du mehan ez mektebê ber didim, vedigerim Swêregê. Beriya ku ez vegerim, Reşo bi min re piçekî suhbet dike. Havînê, ew û hevalên din jî dê bên Kurdistanê, divê em tikiliyên (pêwendî) xwe bi hevdu re dom bikin. Reşo dû ra dibe hevalê Ferîd, gava Ferîd diçe daweta Reşo, tê kuştin.

Ferîd xwendina xwe ya Fakulteya Zîraetê temam dike, biryara xwe daye, dibêje "Ez ê şoreşgeriyê bikim, ez ê profesyonel bim." Ruhsar dibêje, "Ferîd heyran, Ferîd qurban wiha meke, ka em ê çawa debara xwe bikin, ne karê me, ne perê me û ne jî xaniyê me heye, tu yê çawa profesyonel kar bikî?" Ferîd biryara xwe naguherîne, Ruhsar baz dide ba Brahîm, divê Brahîm û hevalên din bi Ferîd re bipeyivinn. Dawiyê Ferîd îqna dikin.

Tayîna Ferîd bo Hîlwanê derdikeve, wê demê xwendavanên ku bi bursê xwendine kar zû bidest dixin, yên ku bê burs in zû bi zû kar nabînin. Ruhsarê bê burs xwendiye, ji ber vê yekê ew bê kar e, bes kêfa wê cîh da ye, li ba Ferîdê xwe ye, ev bes e.

Lê dixin diçin Hîlwanê. Ferîd dest bi karê xwe dike. Xelkê Hîlwanê, gundiyên der û dora Hîlwanê ji Ferîd hez dikin. Ferîd bi dilê xwe yê pak, bi edalet û durustiya xwe dilê wan qezenc dike. Jiyana xelkê, zimanê xelkê dizane, bi wan re ne wek muhendîs, wek hevalekî, wek birayekî dipeyive. Ferîd muhendîsê dewletê ye, meqamê wî, eraba wî ya xusûsî heye, bes ew zarokê vî erdî ye, zarokê xelkê xwe ye, di xizmeta xwe da qusûr nake. Ferîd bi jiyana xwe, bi muemala xwe balê dikşîne, hem bala xelkê û hem jî bala dewletê dikşîne bi ser xwe de. Li vî welatî divê memûr, muhendîs, walî û qeymeqam wek efendiyê xelkê hereket bikin, divê xelk ji wan bitirse, ji wan re hurmetê bike ku giraniya dewletê kêm nebe, roja ku giraniya dewletê kêm bibe, roja ku xofa dilê xelkê sist bibe, dûzan xira dibe, dûzan ji hev da dikeve! Ferîd ji wê imajê re ters dikeve, Ferîd xelkê nake xizmetkarê xwe, şûna wî de xwe dike xizmetkarê xelkê, sînorê di nava xelkê û muhendîsê dewletê de winda dibe.

Bêtirê vê yekê Ferîd, kilaman dibêje, kilamên kurdî, Ferîd bi gundiyan re kurdî dipeyive, Ferîd ji destê wî çi bê dike, dibe alîkar û hevalê xelkê.

Ferîd dema bi vî huner û meziyetên xwe dilê xelkê qezenc dike, rol nake, siyasetê nake, îmkanê dewletê ji bo welatperweriya xwe bikar nayne. Însanekî medenî û pêşverû çawa hereket dike, ew jî wisa hereket dike. Ferîd ji xwe ra sexşiyetekê ava kiriye û li gor wê şexsiyeta xwe muameleyê dike.

Di nava civateke wek a me da xwedî şexsiyet bûyin karekî hêsa nîn e, şexsiyetên hukum dajo di eslê xwe da bê sexsiyetî ye, li ser nezantiyê, durûtiyê, dijminatiyê û derew û dolaban ava dibin. Ferîd derewan nake, mêrkujî û birakujiyê re rûmetê nade, durûtiyê nizane, dijminatiyê jî nizane. Ji xelkê re ne li gora zengîn an feqîrbûna wan, li gora însanbûna wan muamele dike. Xwe bilind nîşan nade, ji tiştê wisa re îhtiyaciya wî tune. Bi eşîra xwe, bi perê xwe, bi mark û dolarên xwe pesnê xwe nade, tiştên wisa ji Ferîd dûr in. Ji bav û diya xwe re hurmet dike, ji wan hez dike bes gava bavê wî yan diya wî yan jî mezinekî wî jê re tiştekî çewt bibêje yan jî ji wî tiştekî nebûyinê bixwaze, Ferîd dibêje na û li hember derdikeve. Ji xeybet û paşdaqisekirinê hez nake, ji van dûr e û xwe nake nav tiştên wisa.

Gava ez bibêjim “Çala rêxê” wê çend kes min fam bikin ez nizanim, ji ber wê ye divê ez behs bikim ka “Çala rêxê” çi ye?

Wexta ez zarok bûm, yanê di salên 1960an de di nava gelek hewşan da çalên rêxê hebûn, yên ku pez an dewar xwedî dikirin, di nava hewşa xwe da kortikek (çal) mezin vedidan û zibilên heywanan li wir berev dikir. Havînê ji wî zibilî tepikên rêxê çêdikirin û zivistanê bi agirê wan tepikan şîva xwe dikelandin,

soba xwe germ dikirin. Germa havînê de bîhn û buxa ku ji van çalan derdiket ne tu hal bû, nefes li merivan dihat birîn. Mêş û kelmêşan ji sibê heta êvarê li ser çalan û wê ava pîs a erqan, dihatin ser nanê te, li ser xwarin û ava te vedinişîn. Wê demê li gelek kuçan de kanalîzasyonê sergirtî tunebû, ava pîs a tuwaletan di nava kuçan da diherikî. Pirê caran mumkun e meriv welatê xwe, bajarê xwe, kuçeyên ku meriv lê mezin dibe romantîze bike. Ez ji viya ra tiştekî nabêjim, bes gava dibim şahidê cehalet û nezaniya însanan, bêyî çalên rêxê tiştek nayê bîra min. Însanên ku ji bo perçeyekî erd, ji bo hezar qaxidî an ji bo qiseyeke çewt erd û ezmanan li hev dixe, qala kuştin, dersdayin, namûs û mêraniyê dike madê min li hev dixe û çala rêxê tîne bîra min. Ew çalên ku bi destê zor û zulmê, ew çalên ku bi destê hêzên tarî, hêzên bêbext, hêzên dijminên însan û însaniyetê, ji bo me hatîne kolan. Ji me ra dibêjin li vê dinê ciyê we ev çalên ha ne, qedera we ev e, hûnê di nava vê çalê de bijîn. Û divê em qebûl bikin ku piştî sed salan, hinekên me hîna ji bo jiyana nav çalên rêxê israr dikin.

Ferîd bi şexsiyeta xwe ya serfiraz, serbilind, pêşverû dixwaze xelkê me ji nava vê çala rêxê derkeve, ji vê gend û gemarê, ji vê bîhn û buxa pîs, dilê xwe, canê xwe, ruhê xwe paqij bike. Ferîd dixwaze xelkê me serê xwe bilind bike, li pêş xwe mêze bike, pêş xwe bibîne. Dixwaze xelkê me dev ji mêraniya ehmeqane berde, ji xwe re mêraniyeke bi mane, bi zanetî ava bike. Ji xwe re, ji zarokên xwe re, ji mala xwe re jiyaneke xweş ava bike.

Mezinbûna Ferîd, qîmet, rûmet, serbilindiya Ferîd, pêşverûtiya Ferîd li vir e, ji vir tê. Meziyetên ku di şexsiyeta Ferîd de tên ba hev, ji bo nivşê me, ji bo xelkê me dibe bingehê şexsiyetên serbixwe, şexsiyetên serfiraz. Şexsiyetên ku jiyana nav çala rêxê qebûl nakin.

## Rêya min û Ferîd ji hev vediqete

Bê mubalexe kurdperweriya nivşê me di destpêkê de bi rengên çep dest pê nake. Sedemên ku nivşê me dike kurdperwer pirr in, bes di wan sedeman da yên herî girîng hereketa Mele Mistefa Barzanî ye. Li Kurdistana başûr şerekî giran dom dike. Barzanî li Kurdistanê dibe sembolek, dibe efsaneyekî azadî û serfiraziyê. Hal û hewalê tevgera Barzanî, ji her aliyan û bi her babetî digihîje her derên welêt. Di wan salan de radyoya deng û basa Kurdistanê li ser pêşveçûyina kurdperweriyê gelek tesîr dike. Xeber û raporên wê radyoyê, kilam û stranên radyoya Êrîvanê ji bo min qedereke nû û teze ava dike. Jiyana min a rojên pêş destpêka xwe ji vir digre, destpêka min ev e. Ferîd ji min mezintir bû, ba û bîhna azadiyê ji Kurdistana başûr derdikeve, beriya min gihîştiye Ferîd. Dema Ferîd li Anqerê di Fakulta Ziraetê de dixwîne, di ruhê wî de pêlên azadî û serfiraziyê rabûne ser piya, Ferîd ji xewa kabûs şiyar dibe, xewa mirinê, xewa berbad, xewa bê bext û bê wîcdan bi cil û cawên xwe ruhê Ferîd terk dike. Ji bo Ferîd bihareke rengîn dest pê dike,

Mehmed Şêxo, Cîgerxwîn, Aramê Dikran û dengbêjên din bi kilamên xwe Ferîd dilorînin. Ferîd kurdperweriyê kişf dike, Ferîd kaniya kurdperweriyê, zimanê kurdî kişf dike. Her dest bi çi dike, bi xweşbînî û dilgermiyek bê sinor xwe davêje nav govendê. Bi zemên re dikeve xarê.

Li hefsa Diyarbekîrê Ferîd ji aliyê gelek hevalên xwe ve tê hezkirin, bes yên jê hez nakin jî hene. Di wê demê de kî çi dibêje an kî çi difikire ez nizanim, li ser wê rewşa wan ya hundir hewceyî bi lêkolinekê jî nabînim. Piştî hefsê ez Ferîd jî dibînim, ew însanên ku ji Ferîd hez nakin jî dibînim, heta bi hinekên wan re têkiliya min jî çêdibe. Bê kêmasî ez dikarim bi rehetî bibêjim ku, di navbera wan kesan û Ferîd de ferqeke mezin hebû. Di hefsa 71an de Ferîd ji kurdperwerekî çep zêdetir, kurdperwer e, di helbesta xwe ya Pêşmerge de kurdperweriya xwe nîşan dide, yên wê gavê kurdperwerên çep in, bi çavekî baş li kurdperweriyê nanêrin. Bi ziman û çavên çepê tirk ji wan re dibêjin, ev "Milliyetçî" ne, evana "Milliyetçiyên burjiwazî" ne. Ferîd di hefsê de nakeve nav xebatên perwerdeyê, şûna wê de nivîsandina xwe ya kurdî bi pêş dixe, dinivîsîne û dixwîne.

Li vir divê ez îtirafekê jî bikim. Beriya ku Ferîd di nava hereketa Kawayê de cî bigre, helbest û kurteçîrokên xwe dabûn min, ji ber ku ez jî dixwazim kurdî bixwînim û binivîsînim. Dîwana Cîgerxwîn û nivîsên xwe dide min, ez alfabeyeke kurdî jî ji xwe re bi dest dixim. Her nîvê şevan ez ji xwe ra kurdî hîn dibim. Daxwaza min ew e ku ez jî wek Ferîd bikaribim bixwînim û binivîsînim. Ez zû fêrî xwendina kurdî dibim, nivîsandin pîçek giran diçe, demekê şûn de riya min û Ferîd ji hev vediqete. Nexweşiyên tevgera çep me hemûyan digre nav pencên xwe.

Em her yek dikevin rexekê, ez ji wî pir hêrs dibim, bê guman ew jî ji min gelek eciz dibe. Ji min çend caran nivîsên xwe dixwaze, ez dibêjim, "Na!" Nivîsên wî li ba min dimînin.

Êdî ez dev ji kurdî hînbûyinê berdidim, ji ber ku ya herî girîng ne kurdî ye, ê herî girîng, kî çiqasî çep û sosyalîst e! Kes naxwaze tenê kurdperwer û welatperwer be, kes naxwaze xwe nêzî van gotinan bike. Ji van du gotinan her kes baz dide, Divê beriya her tiştî her kes bibe Marksist û Lenînîst û dû ra jî bibe kurd. Armanc ev e, şer ev e. Zimanê me hemûyan tirkî ye, wek kewên gozel sibê heta êvarî şeqîna me ye. Em fêrbûna kurdî ji bo rojên pêş dihêlin. Herwiha wext û saet temam dibe ez jî dikevim hefsê, kitab û nivîsên min, bi nivîsên xalo Ferîd ve tev tên veşartin, heta îro jî ez nizanim ku çi bi serê wan nivîsan de hat.

Beriya ku grûbên çep çêbin, têkiliya Necmedîn Buyukkaya û Ferîd pir baş e. Necmedîn û hevalên wî yên kevn dixwazin partiya Dr. Şivan ji nû ve organîze bikin. Ji ber vê yekê Necmedîn dixwaze Ferîd di nava vî kar û barî da ciyê xwe bigre. Bes Ferîd ji pêşveçûnên derdora xwe haydar e, têkiliyên wî bi kurdperwerên din re jî heye. Necmedîn bi Ferîd re pir mijûl dibe, her cara ku tên ba hev munaqeşeyên kûr û dirêj dikin. Gava em tev derdikevin çiyayê Nemrûd, ji Swêregê heta wir bi hev ra dipeyivin, ez li paş wan rûniştî me, destpêkê de dixwazim guhdarî bikim, lê belê ji dengê seyara me tiştek nagihîje guhên min, bes ew hevpeyvîna xwe dom dikin. Ev têkiliyên wan demeke dirêj dom dike, bes netîceyekê nade.

Ferîd jî wek me her kesî para xwe ji nexweşiyên çep girtibû. Hevalên wî yên ji DDKD a Anqerê di rexê Maoizmê de ciyê xwe girtibûn. Ferîd li gel wan tercîha xwe dike û di rêya xwe da dimeşe.

Ferîd dibêje, ger em dixwazin partiyekî nû a Lenînist çêbikin wê gavê divê mirov ji nû ve dest pê bike, em nikarin ser bingeha kevn xaniyekî xweşik û delal ava bikin. Gava Ferîd têkiliyên xwe bi Necmedîn re qut dike, rewş û dîtinên wî ev in. Ji min ra jî wisa dibê, dixwaze ez jî, ji der û dora Necmedîn dûr kevim. Ez wî guhdarî nakim, ez di riya xwe de diçim. Têkiliyên min û Ferîd ji bin de qut dibin.

Bê carekî tenê ez û ew em hevdû nabînin. Ew car jî li Wêranşarê em rastî hev tên. Ahmet Soken hevalekî me yê şoreşger e, hevalekî serbilind û xurt, li Erzeromê di universîtê de dixwîne, Erzerom kela faşîstan e, ulkucî hevalek birîndar dikin, Ahmed ji bo ziyareta wî hevalî diçe nexweşxanê, ulkucî bi rê de ji piştê wî didin ber kêran. Ahmed wefat dike, cenaze tê Wêranşarê. Li Wêranşarê bê hevalên me, Tikko û Kawa jî heye, ew jî dixwazin di cenazê Ahmed de beşdar bin. Hevalên me yên DDKDê û wan bi şertê ku tu aliyek wê sloganên hember Maoîzmê û Sovyetê bikar neynin li hev tên. Bes cardin jî şer derdikeve. Tacoyê me ê Swêregê ku ji Kawayê ye, gurmustek li ser devê hevalekê me dixe, devê lêwik di xwînê de dimîne. Gava meş xelas dibe, hevalekî me jî diçe bi Ahmed (Pişo) re şer dike. Em şer didin sekinandin, bes hevalên Kawayê êrişî ser me dikin, bêrîka min de kêrek destan heye, ez ji bêrîka xwe derdixim û dixim destê xwe, carekê de dibînim ku Ferîd xwe avitiye pêş hevalên xwe û êrişê tîne ser min, wê gavê hemû însanên doraliya me ji ber çavên min wenda dibin, bê Ferîd kesekî nabînim, ez jê re du caran dibêjim, "Ber bi min neyê, ez ê li te xim!" Bes ew nasekine, destvala ye û cardin jî bi ser min da tê, ez dikevim tengasiyê, ez ne dixwazim li wî û ne jî li yekî dinê xim. Êdî dinêrim

çare namîne, ez bê hemd dibêjim, "Meyê ser min, tu xalê min î, ez naxwazim li te xim!" Li ciye xwe disekine, ez wisa bawer dikim ku qiseyekî wisa ewê ji devê min derkeve napê, şaş û mat dimîne, li ciyê xwe disekine, ez jî li xwe şaş dibim, qiseyekî wisa çawa bû ji devê min derket. Hevalên me min paşta dikşînin. Gava em digîhîjin Swêregê hevalên min ji bo wê qisê, min rezîl û riswa dikin. Ez dibêjim, "Min çewtî kir, min efû bikin." Hevalên min, wê gavê min ji dil efû dikin an nakin ez nizanim, bes îro ez hêvî dikim ku zarokên ku li ser vî erdî mezin dibin bira tu cara dilê xwe li hev reş nekin, bira nebin dijmênên ruh û canê hev.

Dema li Hîlvanê dest bi kar dike êdî Ferîd di nava Kawayê de ye. Hem karê xwe dike û hem jî ji semînerekê baz dide semînereke dinê. Li Diyarbekîrê bi hevalên me yên Devrimci-Demokratan re dikeve munaqeşeyê, de wê gavê jî hevalên me wek muxtarê Diyarbekîrê ne, radibin li Ferîd û hevalên wî dixin, di nava kuçeyên Diyarbekîrê de bera wan didin. Di wê demê de û hîn niha jî, em demokrasiyê wisa fam dikin û wisa tetbîq dikin, yên ne ji min, dijminê min e û dijmin divê ji holê rabe, divê cil û cawê xwe bar bike û ji mehela min, ji gundê min û ji bajarê min koç bike. Ger ew koç neke, ceza wî lêdan û kuştin e. Zihniyeta me ya demokrasiyê ev e. Lêdan û tehdît çavên Ferîd natirsîne, diçe Adiyamanê li wir bi hevalên me re dikevin nav munaqeşeyeke gur. Lingekî Ferîd li Hîlwanê û lingekî wî li bajarên din e. Hevalên wî yên Kawayê ji enerjiya wi re heyran dibin, ne tenê hevalên wî, yên Ferîd carekê nas dike carekî dinê ji Ferîd dûr nakeve.

Di warê siyasî de giraniya Kawayê wek DDKD fireh nîn e, bes giraniya Ferîd di warê sosyal û civakî de mezin e, têkilî û

tesîra wî li ser gundiyan û karkeran zêde ye. Ji bo xwe ez dikarim bibêjim ku ez vê giraniya wî ferq nakim, hebûn û tunebûna wî li rojê pêş wê çawa tesir bike û çawa tesir dike ez pir dû ra fam dikim.

Dema Ferîd li Hîlvanê dest bi kar dikê, li Swêregê hevalên wan zêde tune ne, grûbek ji TÎKKO vediqete, di nava vê grûbê de Eyyup Surek heye, bes li Swêregê em ji wî re dibêjin Mao Zedung, ji ber ku pir dixwîne, hemû teoriyên Mao ji ber dizane. Ev heval diçin ba Ferîd. Dixwazin têkiliya xwe bi Ferîd re deynin. Hevdu dibînin, bi hev ra dipeyivin û bi dilxweşî ji wir vediqetin. Ev grub ewê di rojê pêş da bingeha Kawayê li Swêregê fireh û xurt bike. Beriya kuştina Ferîd ev heval ji Kawayê vediqetin, bîr û baweriya wan bi teoriya sê dinya nemaye, ji wan re dibêjin Kawa Red û yên din dibin Dengê Kawa.

Piştî kuştina Ferîd Dengê Kawa tenê du hejmarên kovara xwe çap dikin, hejmara yekemîn ji serî heta dawiyê der heqê Ferîd de ye, li ser qapaxa kovarê rismê Ferîd heye.

Kawa Red, bi navê Kawa sê hejmar kovar derdixin. Hejmara pêşîn di meha Çileyê (Meha 12.) pêşîn 1978an de derketiye, meha piştî kuştina Ferîd de derdikeve, bi kelîmeyekê jî behsa Ferîd nake. Hevalên ku kovarê derdixin ji Ferîd veqetyane, bes Ferîd şoreşgerekî delal e, gulleyên bêbext ne tenê li Ferîd, li me hemûya hatine barandin, vê rastiyê em zû bi zû fam nakin, gava em fam dikin êdî dereng e. Bê guman ez naxwazim li wan nehe-qiyê bikim, tavirên wisa di nav hemû grûbên çep de heye, gava şoreşgerek tê kuştin tenê grûba wî lê xwedî derdikeve, grûbên din xwe kor û kerr dikirin.

Tayîna Ferîd tê Swêregê, Ferîd û Ruhsar dikevin xaniyê Apê Sefo û Ferîd li Swêregê dest bi karê xwe dike, ciyê karê wî li kêleka şûbeya Eskeriyê ye. Tayîna Ruhsarê hîn derneketiye, rojên wê bi apo Sefo û dakê Kejo ve derbas dibin. Ew rojên ku bi Apê Sefo re derbas dibin, di jiyana Ruhsarê de rojên herî xweş in. Apê Sefo bi çîrok û meselên xwe yên renganî rojan li pê hev dixemilîne, Apê Sefo bi zanetiya xwe her roj paceyekê li ber çavê Ruhsarê vedike, gava Ruhsar ji wan paceyan li dinê dinêre, êdî ji kêfan ji ser hişê xwe diçe, ew her roj tiştekî hîn dibe, her roj tiştekî fahm dike.

Ev roj wek xewnên şevan kurt in, ne hayê Ferîd û ne jî hayê Ruhsarê ji rojên pêş heye. Tu kes nizane ku sibê wê çi bibe. Em hemû grûbên kurdperwer, bi zeman re ketine xarê, ji nalên hespên me agir dibare, em saniyeyekê jî li dawiya xwe nanêrin, çavên me hemûya li ser noqteyek pêş bel bûye. Divê em beriya her kesî xwe bigîhînin wir, riya azadî û serfiraziyê amade û ava bikin. Rojên pêş wê ji me re çi astengan bîne û çi neyne ne girîng e, çi tîne bira bîne, ser seran ser çavan.

Em hemû xortên kurdperwer wisa difikirin û wisa dijîn, rewşa ruhê me wisa ye.

Li Swêregê hemû grûbên kurdperwer di nav merhaleyek kurt de çêdibin. Destpêkê da navê me hemûyan di nava xelkê da "telebe" ye, bi xelkê re têkiliyên me yên zêde û fire tune. Munaqeşeyên îdeolojîk bi hemû giraniya xwe dom dike. Herî pêşîn kovara Rîzgarî digîhîje Swêregê, li ser tezên kovarê qiyamet radibe, dibêjin, ev milliyetçiyên kurda ne, yanî ew kurdperwer in. Di eslê xwe de ev êrîşa hanê êrîşa çepê tirkan e, ew çepê tirk ku, gava ez vê nivîsarê dinivîsînim ew ji bo pîrozkirina Peymana Lozanê, li Lozanê dimeşin.

Herwiha gotina min ew e ku, em, xortên kurdperwer yên li Swêregê gora rewşa cîhanê û rewşa çepê tirkan reng û siyaseta xwe tayin dikin. Grubên ku li Swêregê li ser bingehek wisa ava dibin an jî bûne.

Li Swêregê komela "Kultur Sevenler" heye, wext û zemanê xwe de xwendevan û pêşverûyên Swêregê vê komelê ava dikin, komele ji xortên Swêregê re alîkariyê dike ku ew mektebê bixwînin.

Demek şûn da kar û barê wê komelê disekine, em kurdperwerên Swêregê îmza berev dikin û komelê dibin kongreyê, di kongreyê de em komelê digrin. Êdî komela Kultur Sevenlerê dikeve destê nivşekî nû, nivşekî ku sibê heta êvarê bêyî azadî û serfiraziyê behsa tiştekî din nake, gelek pêşverû û welatparêzên rojên pêş ji vir derbas dibin. Pir naçe hindik naçe, dîtinên nû, bîr û baweriyên siyasi wek gurekî têkeve nav pez, me ji hevdû cihê dike, diperçiqîne, serê me her yekî li alîkî dikeve. Ji hev cihêbûyin zêde muşkule nîn e, yên ji bo rojên pêş dibe mişkule, ew bîr û baweriyên ku me ji hev re dike dujmin, me ji hev re dike neyar e. Di rojên pêş de em di nav tasek av da qiyametê radikin, çav çavan nabîne.

Herwiha di 1978an de şûbeya DDKDê li Swêregê ava dibe, Kultur Sevenler dikeve paş, ya li pêş cî digre DDKD ye. Xortên Swêregê li pê hev komelên xwe yên demokrat ava dikin. DEV-DER (Devrimci Gençlik Dernegi), KOY-DER (Koylulerle Dayanisma Dernegi), DDKD (Devrimci Demokratik Kultur Dernegi) şûbeya Swêregê, HALK-DER (Halkla Dayanişma Dernegi), ASK-DER (Anti-Somurgeci Kultur Dernegi), Komela Firneciyan, Komela Înşaatçiyan, Komela Karkêrên Aşxanan di

warê demokrasiyê de ciyê xwe digrin. Divê em Komeleyên mamûr û mamosteyan jî li wan zêde bikin.

Swêreg di nava du salan de, 77 û 78an de dibe du perçe, aliyek ez bi tevayî dikarim bibêjim cebheya pêşverûyan, ceebheya din jî ya paşverûyan e. Ew hêzên ku dixwazin dem û dewrana salan bidomînin destê xwe didin hev û li hember cebheya pêşverûyan dikevin nav çeperên xwe. Li ser pêşverûyan agir dibare, asayîş û huzûra Swêregê ji kok ve tê hilweşandin, şêlandin, kuştin, fidyexwestin, pîrek û qîz rehîn girtin dibin bûyerên rojane.

# Di 78an de Swêreg

Ez dixwazim rewşa Swêregê bi hawakî xweşik nîşan bidim ku, bira em bikaribin bûyerên ku di rojepêş de tên serê me hemû kurdperweran baş bê famkirin, ji wan re îzehetek bê dîtin. Bê guman li Swêregê grûbên din jî hebûn, car ez bi dilpakiya xwe dibêjim ku piraniya xortên di nava van grûban de kar dikirin zarokên kurdan bûn û bi dilpakiya xwe di nav vê xebatê de ciyê xwe girtibûn, wan jî wek me, li gor dîtin, bîr û baweriya xwe xebat dikir.

1977an de DDKD li Diyarbekîrê ava dibe, ji mehan, meha îlonê ye. Li Anqerê hukum di destê MC (Milliyetçî Cephe) de ye. Beriya ku DDKD çêbibe me Komela Kultur Sevenlerê kiriye faeliyetê, û em karekî xurt didomînin. Raketin û rawestan tuneye, gava em çend saetan radikevin cilên me jî li me ye, her deqîqe em amade ne. Di demeke gelek kurt û intensîv de em pêwendiyên xwe bi hemû beşên civatê re ava dikin. Di nav mamoste, memûr, necar, gundî û xebatkaran da heval û sempatîzanên me çêdibin. Di nav paleyên nîskan da em xebateke

xweş dikin, sibê zû gava emele wê li qamyonan suwar bibin, em jî li wir in, bi wan ra dipeyivin, derdên wan guhdarî dikin û ji wan re riya xwe organîzekirinê nîşan didin, carna em jî bi wan re diçin ser erdan û kar dikin.

Em diçin gundan, bi gundiyan re têkîliyê datînin, hevaltî, bîr û baweriya wan qezenc dikin. Bi şevên tiyatroyê jin û qîzên Swêregê cara yekemîn e ji hundirê malên xwe derdikevin. Tiyatroyê temaşe dikin, di nava molayê de helbest û kilamên kurdî guhdarî dikin. Ba û bîhna azadiyê dikin dilê xwe û vedigerên mala xwe.

Dewraneke nû dest pê kiriye, dayik û bavên ku qîzên xwe naşînin mekteban, gava qîzên wan tên Kultur Sevenlerê êdî zêde dengê xwe dernaxin. Wê tiştek neyê serê qîzên wan, dizanin û bawerî tînin.

Nivşê DDKO hebûna kurdan îspat dike, nivşê DDKDê, nexweşiya welatê me û çareserkirina wî di warê îdeolojî de tespît dike. Nivşê me vî dermanê çareserkirinê digihîne xelkê, ji xelkê re rêya xelasbûnê nişan dide û di warê pratîkê de wan serwext û mobîlîze dike. Li Swêregê rewş ev e, ez naxwazim wek mêzîndar, kîjan grûbê di vî kar û barî de çuqasa alîkar bûye an keda wan çi qas e, li mêzînê xim. Ev kar ne yê min e.

Dema ku DDKD ava dibe, reng û ciyên grûbên din jî belî bûye. Li gor bîr û baweriya xwe hemû grûbên çep di nav tevgera kurd de xwe nîşan didin. Perspektîfên çewt û şaş dibe sedem ku gelek caran em bi hev ra şer dikin, wek dîkên li ser kulikan her grûb kulika xwe diparêze. Enerjî, wext û keda me bîlaheq û bîlasebeb telef dibe. Bê guman ez dikarim bibêjim nîvê wexta me ji bo wê leca dîkan heba dibe. Herwiha li Swêregê hedîsên

balkêş dest pê dikin. Ehlên Swêregê li mala xwe, li kuçan tên şelandin, pîrek û qîzên xelkê rehîn tên girtin. Yên van karan dikin ji xelkê xûgiyê dixwazin, pere yan jî zêr. Xelk ji fedyan nikare dengê xwe derxe, cesareta kê heye ku bibêje jina min an qîza min revandine. Mesala namûsê ye, meselekî hesas e, xelk bi dizî pere an zêr ji dost û nasan berev dike û jin û qîzên xwe xelas dikin. Kî vî karî dike kes nizane, bes li gor rîwayetan mahkûmên ku pişta xwe dane axayekî yan jî eşîreteke mezin van karan dikin. Îhtimal e ku pir caran xebera axa û eşîretan tuneye ku mahkûmên wan bi van karan ve mijûl dibin.

Êdî xelkê Swêregê êvaran newire derkevin der, piştî saet siseyan her kes dikeve mala xwe û deriyên xwe kîlît dike. Qahwexanên Swêregê êvaran vik û vala ye. Polîs û cendirme zêde naçe ser van bûyeran.

Li kurdistanê û bi taybetî li Swêregê kurdperwerî di nava xwendevanan de her ku diçe fire dibe, bayê siyasetê herî xurt di nav mekteban de ye, ew mektebên ku zarokên me asîmîle dikin, dibin argûnê agirê azadî û serfiraziyê. Xortên kurd di nav dîwarên mekteban de hem fîzîk û matamatîk hîn dibin û hem jî kurdperweriyê keşf dikin. Kêfa dewletê ji vê pêşveçûnê re nayê. Mekteb li pê hev tên girtin. Behaneya îqtidarê, pevçûna nav grûban e, dibêjin “Fraksiyonên çep sibê heta êvarê bi hev ra şer dikin, demança bera hev didin, ji ber vê yekê em nikarin perwerdeyê bidin domandin, mecbûr em mektebê wisa digrin.” Lîseya Meslekî ya Swêregê tê girtin. Doba lîseya normal e, grûbên Swêregê tên ba hev, divê ew vê behaneya îqtîdarê ji destê îqtîdarê bigrin. Li hev dikin ku tu kes wê li lîseyê belavok bela neke, forûm çê neke û bi hev re şer neke. Ji grûban yek vê

biryarê nas nake. Ger ez ne xelet bim cara yekemîn di nava kurdperweran da demançe diteqe. Ji hevalên me yek û ji wê grûbê jî yek birîndar dibin. Cardin di wan rojan de di nava camêrekî TÎKOcî û hevalên DDKDê de şer derdikeve, gulle tên barandin, kes birîndar nabe. Demekê şûn da hevalên DDKDê û TÎKOcî dikevin rûyê hev, di vê bûyerê de Remezan Can tê kuştin û xortek birîndar dibe. Car bi car grûbên kurdperwer bi hev dikevin bes ev cara yekemîn e jiyana xortekî heba dibe û xortek din heta ber destê ruhstîn diçe û vedigere. Ew bûyer hemû piştî mitîngê dest pê dikin, bûyer li pê hev tên, du-sê rojan carê hadîseyek çêdibe, sedemên xuya dikin, di nava mektebê de forum, belevok belavkirin an jî afîş pêvekirin e. Dîwarên Swêregê bi sloganan hatîne xemilandin, carna grûbek diçe, wan pak dike û sloganên xwe dinivîsîne, ew jî dibe sedemên pevçûnê. Hewa siyasî ya Swêregê wek têlên tenburê tên şidandin. Xelk û xortên Swêregê wek li ser êstiriyan rûnin. Her kes xwe dipê û diparêze. Bêdengiyeke giran daketiye ser Swêregê. Her kesî çav û guhên xwe bel kiriye, kes nizane rojên pêş wê bixwe re çi bîne. 22 qasima 1978an de qedera Swêregê tê guhertin. Kulîlkekî wek Ferîd ji axa xwe tê qetandin. Lê li dû Ferîd wê gelek kulîlk jêbibin, bes xebera me jê tuneye. Bê hay û bayê rojê pêşîn em hespên xwe xar didin.

1978 saleke gelek girîng e, sedemên bûyerên rojên pêş di vê salê de xwe eşkere nîşan dide, girêkorkên di nav salan de hatiye girêdan, yên van girêkorkan girêdane mecbûr dibin, xwe nîşan bidin, di warê siyasetê de bi bejn û bala xwe dikevin meydanê. Li vê meydanê her kes ciyê xwe digre, kî çi dibê, kî çi dike li ber çava ye, tiştekî veşartî tuneye.

Derd û kulên salan gur dibe, zêde dibe, wek bi hezaran însan li dora agirê çaralî bin û pufî agir bikin. Mal û malbat şêlandin di vê salê de dibe hunereke rojane, yên van kar û baran dikin dest û piyên xwe li ba dikin û digerin, ji aliyê çek û cebirxanê kêmasiyeke wan tune, dûrbîn, bombeyên destan, tifingên otomatik, her tiştê wan heye. Gava davên ser malan, gunehê wan bi kesî nayê, li gel wan ferqa jin û mêran tune, zarokan jî efû nakin. Eşqiyayên bi van karan mijûl dibin, roj bi roj metodên xwe pêşda dibin, xwendin û nivîsandina wan temam e, beriya ku bavên ser malekê, ji xwediyê malê re name dinivîsînin, di bin van nameyan da navê DDKDê heye. Divê yên piçekî heş li sêrî heye bifikire, li welatê me bi hezar salan ve ye ku eşqiya hene, ev camêrana heq an neheq ji edaletê bazdane û ketine çiyan, bes ez heta niha şahîd nebûme ku evana beriya ku mal û mulkên xelkê bişêlînin, rûdinin, kaxet û qelema xwe derdixin nameyeke xweşik dinivîsînin. Di 1978an de mekteba Îmam-Xetîb tê şewitandin, yên mektebê dişewitînin nameyekê jî li wir ber didin, di vê nameyê de navê DDKDê cî digre. Hukumet li bûyera temaşe dike, yên malê wan tên şêlandin gilî dikin bes netîceyek dernakeve. Giraniya hukmatê li ser pêşverûyan û welatperweran xwe nîşan dide. Piyesa “Qelen” tê qedexe kirin. Yê biryarê dide waliyê Ruhayê ye, ji bo tetbîqkirina biryarê walî ji Ruhayê teqwiye dişîne Swêregê. Li doraliyê Swêregê teqîna tifinga ye, bêhejmar eşîr bi hev re şer dikin, ev şerê gundî û eşîretan bi rojan dom dike, dengên tifingan digihîje Swêregê, hukmat temaşe dike, ne teqwiye û ne jî mudaxele dike.

Di meha Kanûna pêşî de Ecevît hukemeta xwe ava dike, Milliyetçî Cephe ji îqtîdarê dikeve, yanzdeh milletvekîlî ji

Partiya Edaletê (AP) vediqetin, Ecevît bi saya van yanzdeh kesan hukumeta xwe ava dike.

Li Swêregê jiyana rojane dom dike, camêrekî bi navê Halef Korkut li ser rêya hefsê tê kuştin, mudurê Lîseya Meslekî Alî Uslu tê kuştin, mekteb mehekê tê girtin. Ji eşîreta Qeregiçiyan du kes li nava Swêregê tên kuştin, yek jî birîndar dibe. Li Heçxidirê, hinek pêşiya leşkeran dibirin, ji destê wan sê heb girtiyan digrin û li wir wan dikujin. Meha Kanûnê xelas nebûye, pênc heb eşqiya davên ser mala Şukru Utkun, li ser sifatên wan maske heye, bi destê zorê li mal çi pere û zêr heye bi xwe re digrin û diçin. Cardin wê rojê bi şev li Hecxidirê eşqiya rê dibirin, ji şofêr û rêwiyan nêzî 40 hezar pere berhev dikin, dest û piyên xwe li ba dikin û diçin.

26ê Kanûnê de bûyerek balkêş heye. Li ser riya Çêrmûgê du eşqiya û polîs rastî hev tên, di nava wan da şer derdikeve, di destê polîsan da demançe, di destê eşqiyan da tifingên otomatîk hene, her du polîs li wir tên kuştin. Ev her du mêrkuj demek şûn da tên girtin. Ji wan yek ulkuciyekî bi nav û deng e, sûcê xwe qebûl dike, dibêje "Min û refîqê xwe, me gelek mal şêlandin û me ji gelek kesan fîdye girt." Polîs zêde naçe ser wan, der û dora wan da kî hene, kî ji wan re alîkariyê dike, ji bo çi van karan dikin nayê pirsîn. Piştî kuştina polîsan nihayet teqwiye ji Ruhayê tê Swêregê, xelkê Swêregê hêvî dike ku polisên niha biçe ser eşqiyayan û wan yekayek bigrin. Êdî qanûn û huzûr wê were Swêregê bes wisa nabe, polîs êrişî çefiyên serê xelkê dikin, çefî ji serên xelkê tên girtin, li ber çavên wan tên çirrandin. Bi çefî berevkirinê asayîş nayê Swêregê, reqîn û teqîn berdawam e. Hevalekî me Şevket Aytaş bê sedem û bê sûc li

riya mala xwe tê kuştin. Li Stenbolê faşîst bombe davên ser xwendevanên huqûqê, heft xwendevan tên kuştin, ji wan yek hevalê me yê delal Hemîd Aqil e. Di meha Adarê de em Hemîd dibin Mizarê û defn dikin. Li Swêregê û Diyarbekîrê em Suat Karataş û Yahya Mehmedoglu re alîkarî dikin, em dixwazin ew her du bibin reîsê belediyê. Li Diyarbekîrê em li hember xalê Mehdî Zana alîkariya Yahya dikin. Li Swêregê ger em bixwazin, em karin namzedek bi serê xwe bikin reîsê belediyê, hêz û teqeta me ya wê demê bes dike. Gor biryara hevalên Devrimcî Demokratan em piştgiriya namzedê CHPê dikin. Namzedê CHPê Suat Karataş e. Xwedê bi rehma xwe şa bike, ne mirovekî xirab e, însanekî mulayim û mutewazî ye. Hember welatperweran nîn e, li ba welatperwera ye, bes divê welatperweran namzedek bi serê xwe derxista. Ne tenê ji bo Swêregê, wê ji bo her derê welat, biba semboleke pêşveçûn û serketinê.

Swêreg projeyeke pîlot e, plan û kemînên li wir ava dibin, dezge û dolabên li serê pêşverûyan çêdibin, gav bi gav li bajarên din jî tên tetbîqkirin. Li gor bajarên din Swêreg pir pêşde ye, polîtîzebûyin pir bilind e. Xelkê reben û feqîr li ba xwendevanên xwe cî girtiye, yên neheqiyan protesto dikin, dimeşin, civînan çêdikin êdî ne telebe ne. Pirên ku bi keda şev û rojan ava dibe xelk û pêşverûyan digihînin hev. Ev berhevhatin xofê dixe nav dilê kevneperestan, xewên şevan li wan diherime.

Şerê eşîretan wek her tim berdewam e, bîhna barûda 78an da bi giraniya xwe daketiye ser Swêregê. Qeregiçî û Îzol 1974an de dest bi şer dikin, şerê wan heta 1978an dom dike. 1976an de Alxas û Kelexanî bi hev dikevin, dîsa di wê salê de, Mizrayic-Hedro û Suryan û Razan jî dest bi şer dikin. Ji heşt kesan zêtir însan tên

kuştin, hinek dibin fîrar û hinek jî dikevin paş dîwarên hefsan. 1977an de doba Dêsman û Tuvireka tê, bi hev dikevin, wek her carî li dû xwe mirin, hefs û macirtî ber didin.

1978an de Suryan û Kelaxan şer dikin, ev şera bi rojan dajo, di dawiya vî şerî de koka Suryana hişk dibe, hem ji canê xwe û hem jî ji gundê xwe dibin. Kelexanî gundê wan bi erdê re dûz dikin, serek û serkarên Suryana tên kuştin, çend hebên ku dimînin, cil û cawê xwe berev dikin û dikevin riya macirtiyê. Li der û dor kozikên şer de bi sedan derbên MKE (Endustiriya Makîne û Kîmya) tên tespîtkirin.

Mahmûd Ecem li hember mala Bucaxan şer dike, bes şerê Mahmûd dûr û dirêj najo, şerkarên Mahmûd zarokên wî ne, Mahmûd pişta xwe daye zarokên xwe, bombeyekê diteqê, zarokên Mahmûd Ecem tên kuştin, pişta Mahmûd dişkê, ew û mala Bucax li hev tên.

Herî dawî 1978an de şerê navbera Bucax û Qirwar hatiye rawestandin, wek agirbirînekê çêbûye. Her du alî li ciyê xwe rûdinin, ji bo şerekî nû hêzen xwe ji nû ve didin dûzanê, plan û kemînên nûh çêdikin. Gava şerê Swêregê dest pê dike Qirvar li aliyê PKKê giraniya xwe datîne. Şerê eşîra ne bes, îcar li Swêregê derdê avê dest pê dike, wê salê zêde baran nabare, gundiyên dora Swêregê, pez û dewarên wan bê av dimînin. Xema kesî nîn e, yên dikarin ji gundê xwe koç dikin.

Li mintiqa Hekariyê kurd bi hev dikevin, hêzên YNK (Yekîtiya Niştîmana Kurdistanê) û Qiyadeya Muwaqet hevdu perîşan dikin. Serekhêzên Yekîtiyê Elî Eskerî û nêzî 600 pêşmergên wî tên kuştin. Dewlet mudaxele nake. Piştî ku şer xelas dibe di meha îlonê de tdtbîqata Kanatli-78 çêdibe. Ciyê

tetbiqat çêdike Gever (Yuksekova) e. Li ser hêzên dijmin cilên kurdî hene.

Xelkê Swêregê, ji bo protestokirina tunebûna asayişê meşekê plan dike. Esnaf dixwaze dikanên xwe kilît bikin û bi çelengekê ve kilîtan teslîmê qeymeqamê Swêregê bikin.

Waliyê Ruhayê tê Swêregê tebdîlî qiyafet dike û dixwaze derd û kulên Swêregê bi guhên xwe guhdarî bike. Komela Alîkariya Gundiyan lê Gulanê bi mitîngekê pîroz dike.1000 komando û polîs çaraliyê meydana Qanêqûyê dixin çemberî. Mitîng bê bûyer xelas dibe. Eynî roj saet di 20an de du eşqiya, li Silimpiyarê dixwazin qamyonekê bişêlînin, bes bi ser nakevin, her du jî tên girtin. Eşqiyayek ji gundê Qerexana ji Bismilê ye, yê din jî, ji gundê Qiraxaça Hezroyê ye. Êdî eşqiya ji bajar û gundên derveyî Swêregê tên Swêregê ku xelkê bişêlînin.

Li Ruhayê ulkucî endamê DDKDê Şevket Ozlahlan birîndar dikin. Şevket li Tip Fakultesiya Diyarbekîrê çavên xwe digre. Di cenazê Şevket de Swêreg hemû radibe ser piyan, pîrekên bi çarşevên lacîwerd feryad û figan dikin. Nêzî 20 hezaran însan bi sloganan Şevket defn dikin.

Meha Teşrînê koça mezin dest pêdike, yên kane mala xwe bar dike. Rojnama Îrfan xebera koça mezin wisa dide:

"lê Çiriya Paşîn 1978. Li Swêregê koça mezin dest pê kir.

Bûyerên ku li Swêregê çê dibin dawî li sebir û tehamula xelkê hanî. Yên dikare mal û mulkê xwe bifroşe, bar dikin û diçin. Li ser deriyê xaniyan de îlanên firotanê hatiye daliqandin.

Yên erd û xaniyê xwe difroşin elelecele bar dikin û diçin bajarên din."

Yên koç dikin xwediyê mal û mulk in, lê belê bê qewet û bê pişt in. Zora wan tune ku xwe biparêzin. Piraniya mal û malbatên wisa nameyên tehdît û fîdye digrin, yê name negirtiye nema ye.

Yê xugiyê nade, tê şêlandin, pere û zêrên wan bi destê zorê tê girtin. Eşqiya dest bi rehîngirtinê jî kirine, ji bo xûgiyê pîrek û qîzên xelkê direvînin.

Êdî însanên bê hêz nikare li Swêregê bijî, mafê wan ê jiyanê ji holê hatiye rakirin.

Li vir divê em çavekî bavên hukmatê, gava eşîrên Swêregê mezelên hevdu dikolin, gava hemû pêşverûyên Swêregê ji bo serwextkirina gundiyan, xebatkaran, esnafan şev û rojên xwe dikin yek, em binêrin hukmat çi dike û çi difikire. Îqtîdar di destê Ecevît de ye, Selahattin Tîmûr mudur û sernivîskarê rojnama Îrfanê ye. Di hejmarek Îrfanê de wisa dinivîsîne: "Rojeke havînê, di sohbetek qahwexaneyekê de ku çend abûqat jî hazir bûn, min ji dozgerekî me eynî gazin dikir. Ji kerema xwe ra hêzên ewlekariyê gazî ser vatiniya-wezifeya wan bikin. Van sîlehên ku berra huzûra millet didin rawestînin, ewlekariya mal û canê milet pêk bînin. Bersîva min:

-Ez nikarim hêzên ewlekariyê têxim vê mucadeleya mirinê.

Di meha Tîrmehê de Wezîrê Hundurîn Îrfan Ozaydinli tê Swêregê, ji balkona belediyê dengê xwe bilind dike. Li Swêregê em ê emniyeta can û malê we ava bikin, bes yên li ser dîwaran sloganên îdeolojîk dinivîsîne ji eşqiyayên li ser çiya talûketir in. Wezîrê Hundirîn diçe, li pê wî yekîneya komandoyan tê Swêregê, herî pêşin sloganên li ser dîwaran elelecele tên paqijkirin. Bes şerên nav eşîran û şêlandina xelkê dom dike.

Beriya mitînga DDKDê, hember bihatiyê, faşîzmê û şêlandinê Halk-Der mitîngekê çêdike. Bi hezaran însan dikeve mitingê, mitîng bê bûyer xelas dibe.

Piştî Halk-Der, şûbeya DDKDê ya Swêregê ji bo protestokirina van bûyeran mitîngeke dinê çêdike, bê goman gelek şûbeyên DDKDê di mitîngê de ciyê xwe girtibûn, bes yên girîng bi hezaran xelkê Swêregê; jin, mêr, zar û zêç, kal û pîr, ji hemû salan û ji hemû beşên civatê însan di mitîngê de tên ba hev. Ev mitînga ha dibe îspata xebata me ya şev û rojan, dibe hawarek li hember zulm û zorê, erdê Swêregê bin lingên hezaran de dihêje, qîz û pîrekên nav çarsefên reş de, wek dîwarên Kela Diyarbekîrê li dora civînê çembereke fire û dirêj ava dikin. Li ser Kela Swêregê qomando rêz bûne, tifingên wan li dest, çavê wan li me ye. Çaraliyê me tije leşker in, gelek teqwiye hatiye, meydana Qanêqûyê û kuçên doraliya meydanê heta qirikê xelkê tije kiriye, lîlandinên pîrekan dilê dostan ji kêfan dilê dijminan ji tirsan dilerizîne.

Qet ji bîra nakim, di wan rojan de deve hatibûn dizîn, beriya ku ez peyva xwe dest pê bikim hevalan ji min ra mesela deva behs kirin. Xwediyê deva hatibû ba hevalên me û alîkarî xwestibû. Di nava peyva xwe de min got yên deve dizîne em dizanin kî ne, ger ew devan bernedin, em ê bi hezaran însan re êrişê bibin ser wan. Gava mitîng xelas bû, deveyên me jî azad bûn. Xeber hat, gotin deve berdane, deve wane li kuça Hurriyetê dimeşin. Piştî çar saetan mitîng bê qeza û bê bela xelas dibe, lê bûyer dom dikin.

Du roj piştî mitîngê keçikek 10 salî tê kuştin, bayiyekî Tekelê tê kuştin, kesekî din li kuçê tên kuştin.

Çend roj şûn da li kuça Hurriyetê şer derdikeve, ji Halk-Ðerê Remezan Can tê kuştin û endamê me Muzaffer Alkoyun jî birîndar dibe, ji ber vê yekê mektebên lîseyê ji bo hefteyek tên girtin.

Du yan jî çar roj piştî kuştina Remezan Can, Ferîd tê kuştin. Rojnameya Îrfan xebera kuştina Ferîd wisa dide:

"Ferîd Uzun ji aliyê destên nenas, bi bêbextî hat kuştin. Xortê bijarte yê Swêregê muhendîsê bilind ê ziraetê Ferîd Uzun di 22. 11. 1978an de li ber mala xwe, dema ew û keça xwe li erebê siwar dibin, bi destên qirêj ên bêbext hat kuştin. Mêrkuj ji destpêka sibê li benda Ferîd bûye ku ew were malê. Mêrkuj xwe nêzikî Ferîd dike û bi pênc derban Ferîd dikuje û hevalekî ku li ba wî ye jî birîndar dike.

Ferîd Uzun di sala 1945an de li Swêregê tê dinê, ew piştî dibistana destpêkê û navînê, li Fakulteya Ziraetê ya Anqerê di sala 1975an de dibe muhendis. Wî dema li Fakultê dixwend, bû têkoşerê rîzgariya xelkê xwe. Ferîd Uzun li dema rejîma 12ê Adarê de di mahkemeyên eskerî yên Diyarbekîrê de hat mahkemekirin û pênc sal ceza hefsê girt. (Ceza ne pênc sal bû, 14 sal bû. P.U) Wî di dadgehan de bi mêranî doza xelkê xwe parast. Ferîd Uzun di hemû jiyana xwe de ji bo ku xelkê wî jiyaneke xweştir bijî, li dijî kolonyalîzmê, emperyalîzmê, faşîzmê û kevneperestan têkoşiyaye. Cenazeyê Ferîd Uzun roja 23. 11. 1978an piştî nimêja nîvroyê, li ser milê hevalên wî yên têkoşer û hêjmareke mezin ya xelkê bo

Goristana Asrî hat anîn û li wê derê hat defnkirin. Qatîlên Ferîd Uzun Ferîd nekuştin, lê ew di nav dilê gelê xwe da bû abîdeyek nemir. Bîranîna wî, wê bibe rêbera mirovatiyê."

Ji destpêka meha Kanûnê heta roja ku Ferîd tê kuştin, li Swêregê û li gundên Swêregê 44 kes tên kuştin, 16 kes birîndar dibin, 8 şêlandin, sê heb rehîngirtin çêdibin. Tevî hev çar kes tên girtin, du hebên wan mêrkujên polîsan e, du hebên dinê şêlankerên biyanî ne, yek ji Bismilê û yê din jî ji Hezro ye. Di vê demê de polîs û cendirme 3 demançe, 4 carcor û 21 heb fîşek bi dest dixin. Ez van hejmaran ji xeberên rojnama Îrfanê derdixim, xeberên resmî ne, li ser raporên polis û cenderman çêbûne. Di nav van hejmaran da bûyerên ku neketine raporan cîh negirtine, ji ber vê yekê em dikarin bi rehetî bibêjin, kuştin, şêlandin û talanên li Swêregê qewimîne ji vê hejmara resmî bilindtir in.

Şerên di nav eşîran de ji bo civata kurd ne tiştekî xerîb e, ev şer her tim hebûne, diziya pez û dewaran jî wisa ye, pez û dewarên gundiyan tên dizîn, yek caran şop li ser dizan û pezan wenda dibe bes gelek caran şopa wan tê dîtin. Camêrek an serokeşîrek dikevin navbera xwediyê mal û dizan û bi babetekî mesele çareser dibe. Bes ev bûyerên li Swêregê çêdibin heta noqteyekê wisa ne, demek şûn da tên guhertin. Gava tu 1978an de li gundên dora Swêregê dinêrî, li her derî reqîn û teqîn heye, eşîret û gundên cîranên hev, bi hev re şer dikin. Cendirme zêde mudaxele nake, Wezîreta Hundir berpirsiyara asayişa hundirîn e, bes ji wir jî zêde deng dernakeve.

Kuştina Ferîd qedera Swêregê diguherîne, grûba Ferîd Kawa ye, Kawa li Swêregê grûbek zêde mezin nîn e, hêzên wan, kar û barên wan wek DDKD fire û xurt nîn e. Bes Ferîd mezin e, giraniya wî, qedr û qîmeta wî ya li nava xelkê pir zêde ye. Di wê merhelê de ez bi xwe vê ferq nakim, ez bawer dikim ku gelek hevalên me jî, ji giraniya Ferîd ne haydar in. Bes yên ku gulleyan

li Ferîd dibarînin, dizanin, dizanin ku ciyê Ferîd di nava Swêregê de, dervayî Swêregê de bilind e, gulleyên ku li Ferîd bên barandin wê hem qedera Swêregê biguherînin û hem jî li ser qedera welatê me tesîrek mezin çêbikin.

Wisa jî bû, xerîteya Swêregê a siyasî hat guhertin, li wir jî nesekinî, piştî şerê hundir, Swêreg vik û vala bû, mal û malbatên bi sed salan ve li Swêregê jiyabûn, mal û mulkê xwe, rez û erdên xwe, mezelên xwe, dîroka xwe, koka xwe li dû xwe hiştin û barkirin çûn, li welat û bajarên xerîban bûn macîr.

## 22 Çîriya paşîn 1978

Ado, Misto, Reşo, Huso û Brahîm, hevalên Ferîd pir in lê jiyana van pênc kesan û Ferîd pir ketiye nav hev, jiyana wan bi jiyana Ferîd ve bûye yek. Di destpêkê da ji wan kesekî nizane ku rojen pêş da wê çi bê serê wan, hevaltiya wan û Ferîd jiyana wan ji binî diguherîne, 27 sal piştî kuştina Ferîd ev heval hîna jî bi babetekî bi Ferîd re dijîn, dev ji hevdu bernadin, ew di jiyana Ferîd de, Ferîd di jiyana wan de xwe didomîne.

Yê ji wan herî baş nas dikim Brahîm e, ez û Brahîm sê salan bi hev re çûn liseyê, Lîsa Meslekî ya Swêregê, ez beşa Teswiye, ew jî besa Înşaatê dixwîne. Di navbera me da hevaltiyek baş û delal ava dibe, di taxima mektebê de em tev futbolê dilîzin. Demek şûn da em tev derbasî Kale Sporê dibin û li wir futbolê dom dikin. Kaptanê me Mustefa ye, bes em ji wî re dibêjin "Qadas", însanekî hêja, delal û nefspiçûk e, ji me xortan re dibe rêber, me ji tiştên çewt û xirab diparêze û hemet dike.

Rojekê ji rojan ez û Brahîm diçin serdana Ferîd, ez ji leşkerê qerdiyan re dibêjim, "Ez ê Ferîd bibînim." Brahîm jî eletexmîn

navê camêrekî dibêje. Ez ji Brahim re dibêjim, tu wî camêrî nas nakî, te ji bo çi navê wî got? Brahîm dibêje, navê wî û ê min wek hev e ji ber wê yekê min navê wî got, navekî din nehat bîra min.

Ferîd û ew camêr tên ber têla serdanê. Ew li aliyê hundir û em jî li aliyê der, hal û xatirê hev dipirsin.

Hevalê min Brahîm cara pêşîn li wir Ferîd dibîne û nas dike. Di rojên pêş da Brahîm û Ferîd wê di rexekî de cî bigrin. Ihtimal e ku wê gavê ne Ferîd û ne jî Brahîm tiştekî wisa texmîn nakin, lê belê qeder wan her duyan tîne ba hev, heta ku roja Ferîd çavên xwe digre, Brahîm her tim li nêzî Ferîd e. Beriya kuştina Ferîd ew li Anqerê mekteba xwe dom dike, her ku fersend çêdibe an hatina wî ya Swêregê hewceyî dike, Brahîm baz dide tê, bi Ferîd re tev kar û barên xwe yên siyasî dimeşînin. Rojên xwe yên teng û giran, rojên bi qehr û qotikan, rojên xwe yên xweşik û dilgeş tev dijîn, canê xwe yên delal û pak, ji talûke, tehdîdan re tev dikin sîper. Di bin tirsa lêdanê de, ji semînerekê, baz didin semînerekê. Qedera wan wek kûregirêkekê dikeve nav hev, di nav vê kûregirêkê de kîjan qedera Ferîd e û kîjan ya Brahîm e kes nizane. Ne tenê qedera wan, dirûvê Brahîm û Ferîd jî bi hev dimînin, rojekê li sûkê xaltiya Brahîm rastî Ferîd tê, dikeve milê wî dibêje “Brahîmê min tu çawa yî?” Piştî kuştina Ferîd, Brahîm ji bo semînerekê diçe Sêrtê. Gelek qîmet û rûmet nîşanî Brahîm didin. Çend sal berê Ferîd li wir bi navekî cuda semînerekê dide ji ber wê yekê millet bawer dike ku Brahîm ew meriva ye.

Roja Ferîd tê kuştin Brahîm ne li ba Ferîd e, ew li Anqerê ye, çawa xeber digihîje wir, ew û Ahmedê pismam bi otobusê dikevin rê, her du jî xwendevan in, perê wan tune ku bi balafirê biçin, ne ew û ne jî Ahmed nagihîjin ser cenazê Ferîd.

**22yê Çiriya Paşîn, Ferîd ji xewê radibe.**

Havîna dûr û dirêj ciyê xwe hêdî hêdî terk dike payizê, payizek nerm û hênik daketiye ser Swêregê. Pelên daran û mêwên li nav rezan li ber bayê payîzê xwe li ba dikin û ji gulînçekên xwe diweşin erdê, ji aliyê Silimpiyarê û Şîrînqûyê hewt-hewta kûçikan tê. Roj zû ve ye hilatiye, Swêreg hêdî hêdî şiyar dibe. Bê çend kesan wê rojê dê çi were serê Swêregê kes nizane.

Ferîd bêhemd di nav ciyê xwe de hilo dibe, Yekbûn xwe davê ser wî û li ser laşê wî xwe hilo dike. Ew dixwaze bavê wê şiyar be û piçekî bi wê re bilîze. Xewa bavo ne giran e, bi salan mekteb xwendiye, mekteba yekemîn, navîn, lîse û dû re jî universîte xwendiye. Ew bi disîplîn e, dikare wexta xwe de ji xewê rabe, bes wê şevê heta saetên dereng kitab xwendiye, zêde xew neketiye çavên wî, ji ber wê yekê laşê wî pêçekî giran e. Yê şeva çûnê herî zêde mijûyê wî mijûl dike, mesela xwarziyê wî ye. Divê biçe ba xwunga xwe, a girîng ev e, xebera ku şeva çûnê gihiştiye wî qet ne baş e, divê wê xeberê bide Paşê an jî bide xwunga xwe ku ew jî ji Paşê re bibêje. Xeber, xebera şer e, ne ya xêrê ye.

Li gor xeberê, Paşa dê bê kuştin. Ji ber vê yekê wê şevê xew neketiye çavên wî, dixwaze piçekî zêde razê, bes Yekbûn nahêle, niha jî porê bavê xwe dikşîne, de were ku razê. Ferîd çavên xwe vedike, bi her du destan Yekbûnê digre û radike hewayê û bi wê re henekan dike û dû re wê li ser lingên xwe dide runişkandin. Bi wê re qelanqîzîk dilîze. Yekbûn ji qelanqîzîkê hez dike, wek meriv li deveyekî siwar bibe, pêş da û paş da diçe û tê. Bavo hewl dide xwe ku ji nava ciyan rabe ser xwe, Yekbûn dibêje, piçekî din bavo, piçekî din. Ferîd cara dawiyê qîza xwe li ser lingên xwe hêj dike, dû ra wê dike himêza xwe û maç dike. Ya Rebî ez çuqas ji

vê keçikê hez dikim, bav û diya wî tên bîra wî, rojên zarotiya wî li ber çavên wî wek xewnek şevan derbas dibe. Beriya ku bibe xwedî zarok, pir caran nedihat malê, diçû bajarên din û diket civîn û semîneran. Ne xebera dakê Kejo û ne jî xebera Apê Sefo çêdibû ku Ferîd li ku ye. Bi şevan xew nediket çavên wan. Gava Ferîd dihat malê tirs û xofa dilê wan sivik dibû. Digot lawo, lawo qet nebe ji me ra bibêje tu diçî ku em zêde netirsin. Wî jî digot de ev çi halê we ye, ez newêrim gavekê bavêm, hûn qiyametê radikin. Telaşa we bîleheq e.

Gava Yekbûnê ji hemêza xwe datîne jêr ev qise tên bîra wî, Xwedê neke tiştek were serê Yekbûnê ez ê çi xweliyê li serê xwe kim? Telaş û tirsa dê û bavê wî tê bîra wî, niha gava zarokê wî heye ew jî wek wan difikire, wek wan hîs dike.

Diçe banyoyê, dest û riyê xwe dişo, bi xawliya kêleka lawaboyê riyê xwe pak dike. Li neynêkê dinêre, şeyê xwe ji dolabê derdixe çend caran porê xwe berbê aliyê rastê ve şe dike, di neynikê de li porê xwe dinêre, di nav porê xwe yê nermik û qemer de têlek spî nabîne. Li simêl û biriyên xwe yên zirav û reş dinêre, bişirînek li ser riyê wî vedide. Bi gavên lez ji wir derdikeve û dikeve mitbaxê, Ruhsar beriya wî şiyar bûye, taştê çê dike. Tayîna wê hîn dernektiye, rojên wê li mal û li ba hevalan derbas dibe. Gazincê nake, ji jiyana xwe dilgeş e, piştî salên dûr û dirêj, nîhayet ew û Ferîd ji xwe re wek çûçikan hêlînekê ava kirine, Yekbûna wan jî di bin baskên wan de bi kêf û hezkirin mezin dibe.

Pişta wê li Ferîd e, Ferîd bêdeng xwe nêzî wê dike, ji para wê dike himêza xwe. Hundirê Ruhsarê diqete, piçek bi henek û piçek bi hêrs dibêje, Ferîd tu çi dikî? Te hundirê min qetand!

Ferîd wek zarokan dikene, Ruhsar di nav piyên wî de xwe dizivirîne, hevdu maç dikin.

Ferîd li masa taştê dizivire wek pir caran dixwaze li ser lingan çend parî taştê bixwe, Ruhsar pê de diqehirê dibêje gelo tu nikarî wek însanan li ser sandalyê rûnî û bi me re taştê bikî? Çavê Ferîd diçe ser penîrê kelandî yê ku Ruhsarê di rûn da sor kiriye, av ji devê wî diçe, ji penîrê sorkirî hez dike. Penîrê kelandî yê Qerecdaxê bi taybetî ji bo Apê Sefo çêdibe û her sal tînin teslîmî Apê Sefo dikin.

Dema Mehemed, Hesen û Ferîd li Anqerê mekteb dixwend, Apê Sefo her tim penîrê wan ê kelandî û suncixên gûza ji wan re dişand. Suncixên ku zêde dima dakê Kejo dikir sandiqa xwe, gava torin diçûn ba wan suncixê xwe derdixistin û bi torinan ve par ve dikir.

Mehemed di salên xwe yên ciwan de wefat kir, Hesen bi xanima xwe li Anqerê ma, niha tenê Ferîd mabû, Apê Sefo penîrê Ferîd ji bîr nekiribû. Penîrê ku Ruhsarê wê sibê ji bo taştê sor kiribû ew penêr bû.

Ferîd dibêje heyrana te bim, min efû bike, divê ez niha biçim ku bikaribim karê îro piçekî zû xelas bikim. Tu zanî piştî nîvro em ê biçin daweta Reşo, li dawetê em ê li ba hev têr rûnin. Sifetê Ruhsarê ronî dibe, li Ferîd dinêre. Yekbûn tê mutbaxê dibêje dayê ez birçî me, gava çavê Ruhsarê li Yekbûnê dikeve, dilê wê germ dibe.

Yekbûn baz dide ba bavê xwe, xwe davê himêza Ferîd û bi lêvên xwe yên çûçik gepên bavê xwe maçî dike.

Ferîd derî vedike, gaveke xwe davêje der û li ciyê xwe disekine. Xebera ku wê li Paşa bixin ji Ruhsarê re behs nekiriye. Heta wê

rojê tiştekî xwe ji Ruhsarê veneşartiye, çi dizî çi eşkere jiyana xwe bi Ruhsarê re par ve dike. Bes di wê deqîqê de nikare biryarekê bide. Siyasetê ez û Paşa ji hev dûr xistine, bes Ruhsar ji Paşa hez dike, niha ez rabim ji wê re bibêjim wê bêhuzûr be, baştir ku ez behs nekim. Ji hevalên xwe re jî behsa vî tiştî nekiriye. Çawa bike? Ger rabe ji hevalên xwe re bibêje, îhtimal heye ku ew çewt bifikirin, bibêjin binêre sêvên darê dikevin bin darê, Ferîd hîn xwe ji merivatiyê û eşîrtiyê xelas nekiriye. Gelo Paşa di nava rexê sosyal faşîstan e, em hember wan şer dikin, em dibêjin şerê azadiya milletê me û şerê li hember sosyal emparyalîzmê, sosyal faşizmê, ji hev cihê nîn e. Ez heq didim hevalên xwe, ji ber wê yekê jî ez bi wan re me. Bes Paşa cardin jî xwarziyê min e, li ber çawê min mezin bûye, ger hinek dikin wî bikujin divê kêmasî ez Paşê ji meselê haydar bikim.

Ruhsar dibêjê Ferîd xêr e, tu ji bo çi sekinî? Tiştek tune dibêje û derî hêdîka li dû xwe digre û ji nêrdiwanan dadikeve jêr.

Rêya ereban ji ber mala wî derbas dibe, ji aliyê rojhilatê ber bi Diyarbekîrê û rojhavayê jî ber bi Ruhayê diçe. Mesafeya di navbera karê Ferîd û mala wî de bi texmînî dora kîlometrekê ye. Li hember xaniyê wan, xaniyên terzî û karkeran hene. Çend sal beriya ava bûne. Li dora her xaniyekî baxçeyekî çûçik jî çêkirine. Yên rewşa wan piçekî baş e, ji xwe ra ketine van xaniyan. Apartmana ku Ferîd lê dimîne jî nû çêbûye û li ser 5-6 qata ye. Gava meriv ji Swêregê diçe Diyarbekîrê, mala Ferîd li ser piyê rastê, malên terzî û karkeran li ser piyê çepê dimîne. Li aliyê rastê, şantiya Karayollariyê cî digre, mesafeya di navbera şantiyê û mala Ferîd de ji nîv kîlometreyê zêdetir nîn e. Li hember Karayollari Mekteba Yatilî, û li kêleka wê jî meydana fûtbolê heye.

Ferîd derdikeve ber apartmanê, li aliyê rastê, ber bi Silimpêyarê mêze dike, dû ra li aliyê çepê dinere û derbasî wî aliyê rê dibe. Rê asfalt e, bes peyarê tune, Ferîd li kêleka rê dimeşe, gava ji ber mala apê Şewket derbas dibe, serê xwe radike û li paca wan mêze dike, kesî nabîne.

Dema Ferîd name ji bavê xwe re dişîne û dibêje ez dixwazim bi Ruhsarê re bizewicim, Apê Sefo qiyametê radike. Yê ku Apê Sefo îqna dike apê Şewket e. Ew li Karayollarî kar dike û di xaniyekî karkeran de dimîne.

Wek her dem Ferîd bi peyatî diçe ciyê karê xwe. Wê rojê jî wisa dike. Van meşên sibê kêfa wî tîne, hem piçek bayê pak digre hem jî, pirsgirêkên di serê xwe da dixe dûzanekê. Wê sibê her çawa dike bi ser nakeve, pirsgirêkên di serê wî de nakevin dûzanê, her yek bi aliyekî ve diçe, lê yê serê wî mijûl dike, Paşa ye. Yên dixwazin wî bikujin, wê çi qezenc bikin? Bo çi dixwazin wisa bikin? Yên biryara kuştina wî dane kî ne? Yên tetikê bikşînin kî ne? Bersîva van pirsan nabîne, bersîvek maqûl tuneye. Hişê wî diçe, pirsgirêkên di mejiyê wî de dibin wek girêkekî mezin û li ser sînga wî rûdinin, bîhna wî teng dibe. Serê xwe radike, dinêre gihîştiye karê xwe, beriya ku têkeve hundir li ser milê xwe yê çepê dizivire, li xaniyê Kultur Sevenlerê dinêre. Dibe ku Paşa niha li wir e, bes ez nikanim biçim wir, li ber çavên xelkê, ez ê çawa biçim dergaha sosyal faşîstan, serekê Kawa dê çawa biçe nava dijminan, em ê çi bersîvê bidin xelkê? Qethîne nabe, baştir e ez biçim ba xwunga xwe, ji wê re bibêjim, bira ew jî Paşa haydar bike, herî maqûl wisa ye. Ferîd dikeve hundir.

Gava Ferîd li xaniyê Kultur Sevenlerê dinêre, Paşa, yanî ez, li hundir runiştî me. Gava Ferîd raza ye, ez şiyar im, wê şevê ez û

çend heval em raneketine, çipkek xew neketiye çavên me. Li kuça hember Kultur Sevenlerê maleke hevalê me heye, wê şevê em li wir dimînin. Sibê zû em tên komela xwe vedikin, sobê vêdixin û li dora sobê rûdinin. Em wek xeyaleta ne, deng ji me dernakeve, min çavên xwe li agirê nav sobê bel kiriye. Hevalek radibe çay dem dike. Gava germiya sobê gur dibe, em li ser sandalyên xwe sist dibin. Du xort dikevin hundir, salên wan ger ez şaş nebim li dora bîstî ne. Li serê yekî şewqê Swêregê heye, biriyên wî qalind, reş û eniya wî fire ye. Simêla xwe bi meqesê qusandiye, şelwar, çakêt û solên meqab lê ye. Renga wî esmer e. Ne kin ne dirêj e, bejna wî normal e. Hinek însan hene, dema meriv carê dibîne ne mumkun e ji bîr bike, ev lawik jî wisa bû. Yê din nayê bîra min, şeklê wî zêde ne balkêş bû. Bes bi Swêregiya namînin, xerîb in, silavê didin, em silavên wan digrin û li dora sobê ji wan re cî çêdikin. Rûdinin, em carekî din merheba didin û ji wê pê da ne ji me û ne jî ji wan deng derdikeve. Tu dibêjî qey li ser me heriya mirinê reşandine. Ji pacê li der dinêrim, tîrêjên tavê xwe li dîwarê baxçê xistine. Radibim diçim der, pişta xwe didim dîwarê baxçê, berê min li derî ye. Li ser min çakêt heye, destên min li ser sînga min in, min her du destên xwe li ser sînga xwe li hev girêdane. Bîskeke din ev du kes ji hundir derdikevin, yê şewqe li sêrî li pêş, ê din li paş e. Ez û yê li pêş li hev dinêrin, bê hemdê xwe ez destê xwe yê rastê hêdî hêdî dixim bin paşila xwe ya çepê, wek ez dixwazim ew fam bike ku ez destê xwe davêm demança xwe, bes li ser min demançe tune. Camêrê pêşî tiştekî nake, ber bê deriyê baxçe dimeşe û li min dinêre. Heta niha jî min fam nekiriye ku min çima wisa kir.

Yê ku piştî nîvro gulleyan li Ferîd dibarîne ji wan her du kesan ê bi şewqe ye. Ez niha bê guman dikarim bibêjim ku, ew ji bo lêxistina min hatibûn komelê. Ihtimal e ku gava min destê xwe avêt paşila xwe, wan fam kir ku ez bi tedbîr im, çend hevalên min jî li hundur rûniştibûn. Nehat hesabê wan, ji min wazgêç bûn.

Bûyerek balkêş jî li Anqerê çêdibe. Çend roj beriya kuştina Ferîd, du kesên nenas nîvê şevê diçin ber deriyê mala diya Ruhsarê û dixwazin têkevin hundir. Bes Ferîd li wir nîn e, li Swêregê ye, yê li wir dimîne hevalê Ferîd ê herî baş e, Brahîm û xanima wî ji bo demekê kurt li wir dijîn.

Ev du kes dixwazin bi destê zorê têkevin hundir, wê gavê Brahîm dibêje, destê min de demançe heye, ger hûn têkevin hundir ez ê bera we dim. Ew zilam vedigerin. Qenaete Brahîm ew e ku ew du kes ji bo kuştinê hatibûn.

Yên wê sibê dixwazin li min xin û yê wê rojê piştî nîvro li Ferîd dixin ne ji Swêregê ne. Ji ciyekî an ji bajarekî dinê hatine Swêregê, Swêregê baş nas nakin. Hinek kes divê ji wan re yataxî bikin, kuçên Swêregê, qereqolên polîsan, mala Ferîd, mala min, ciyê karê Ferîd, ciyê komala me û komela Ferîd, riya mala min û Ferîd, qahwexanên em diçin, nîşanî wan bidin.

Biserketina vê planê girêdayî ye ku mêrkuj neyên naskirin û neyên girtin. Gava mêrkuj bête naskirin, plan ê têk biçe. Ew, beriya ku gulleyan bibarînin divê deh cara bifikirin ku ew ê ji sedî sed bi silametî ji ciyê bûyerê bikaribin dûr bikevin.

Bêyî van her du mêrkujan hinek însanên din di nav vê planê de ciyê xwe girtine, pêwestiyên xwe gor planê tînin cîh. Beriya kuştina Ferîd û dû kuştina Ferîd rêberiya xwe pêşkêş dikin,

mêrkujan li malên xwe dihewînin, nan û ava wan didin ber wan, nivînên nermik û germik ji wan re radixînin, bi hevdu re suhbet û henekan dikin û cixaran dikşînin. Û piştî 27 salan hîna jî ji devê xwe tiştek nerevandine, ne xwe û ne jî mêrkuj eşkere nekirine.

Netîceya ku derdikeve pêş me ev e, ku derveyî van her du mêrkujan hinek kesên din, dizanîbûn ku Ferîdê dê wê rojê bê kuştin.

Pirsgirêka ku ez jê re bersîvê nabînim ev e: Kî ji Ferîd re dibêje, wê Paşa bikujin? Yê vê informasyonê dide Ferîd kî ye? Û ji bo çi vê informasyonê dide Ferîd?

Li Swêregê yên ez nas nedikirim tunebûn, çima ji merivekî, hevalekî min re nabêje û diçe ji Ferîd re dibêje?

Gava Ferîd bi min re mijûl dibe, haya wî tuneye ku gav bi gav, deqîqe bi deqîqe ber bi mirina xwe ve dimeşe.

Camêrê ku gulle li Ferîd dibarîne, tetikçî ye, yanî di destê hinekan da maşe ye. Ferîd nas nake, gava Ferîd nas bike, gava bizanibe ku Ferîd çi însanekî delal û welatperwer e, dibe ku tatbîqkirina emrê kuştinê qebûl neke. Wisa nabe, bê wîjdan û bi çavsorî gulleyên xwe li ser Ferîd direşîne.

Ger ev tetikçî ye, gelo yên li pişt wî kî ne? Biryara kuştina Ferîd ji bo çi girtine? Di girtina vê biryarê de ji wan kîjanî rola herî girîng lîstiye? Û ji bo çi dixwazin Ferîd bikujin?

Ferîd ronekbîrê kurda ye, Ferîd dengbêjê milletekî bindest e, Ferîd helbestvan û kurteçîrokvanê edebiyata kurd e, Ferîd welatperwer û şoreşgerê welatekî mazlûm e. Ferîd li kesî neheqî nekiriye, di dolab û firildaqa de tiliya Ferîd tuneye. Xirabiya kesekî naxwaze, mezelê kesî nakole. Mumkun e ku hinek axa û

beg hatine daîra Ferîd û xwestine, ji heqê xwe zêdetir gubre bigrin, mumkun e ku Ferîd gotiye ez nikarim wisa bikim, heqê te çî ye ez ê heqê te bidim. Cardin mumkin e ku ev axa yan jî beg ji Ferîd hêrs bûye, dibe ku di nava wan da munaqeşeyek jî çêbûbe. Bes axa û began bi hezar salan e ku xelk kuştine an jî dane kuştin, di civata kurda de meriv kuştin kar û barê rojane ye. Bes mêrkujên di nava vê çarçovê de çêdibin, demeke dûr û dirêj nayên veşartin, ne mumkin e ku bên veşartin. Rojekê, li civatekê, li malekê ev eşkere dibe. Hinek ji devê xwe derdixin, kî mêrkuj e eşkere dike. Ji kuştina Ferîd heta îro 27 sal derbas bûne, heta niha tu tiştek eşkere nebûye, tu tiştek derneketiye meydanê ku axa û began nîşan dide.

Li Amerîkayê John F. Kennedy, li Swêde Olof Palme û li Turkiyê bi sedan însan hatine kuştin, ger em istîsnayan ji nav derxin, yên di biryardayina van kuştinan da cî girtine zû bi zû eşkere nabin. Tetîkçî tên girtin yan jî eşkere dibin, bes yên biryar dane, yên demançe xistine destê tetikçiyan û ji wan re gotiye biçin filan kesî bikujin, bi hêsanî eşkere nabin, her çuqas wext derbas dibe ewqas jî av li ser wan zelal dibe.

Yê bixwaze însanekî wek Ferîd bide kuştin, kî ye an kî ne?

Ez nikarim ji sedî sed bibêjim kî ne, bes min tetikçiyê ku 22yê Çiriya Paşîn de gulle li Ferîd barand, bi çavên xwe ew dît, em li hember hev rûniştin, me li nav çavên hevdu nêrî, û ji ber min derbas bû û çû. Yên demançe dabûn destê van hîna jî ne belî ne, lê belê tiştek belî ye. Ev jî ew e ku ev kes dostên, hevalên û dilşewîtiyên milletê kurd nîn in. Ji ber vê yekê bi rehetî biryara kuştina Ferîd didin, tetbîq dikin û dikarin heta îro roj xwe veşêrin.

Nîvro nebûye, Ferîd li ciyê karê xwe hinek ewraqan îmza dike, ji hinek ciyan re telefonê dike, çend heb gundî li derveyî oda wî runiştine, dipên ku doba wan bê. Ji bo gubre wê muracaatê bikin. Ferîd destê xwe lez digre, divê beriya nîvro xwe bigîhîne xwunga xwe.

Pîrekekî ji cîranên Ferîd, cilên mala xwe dişo, derdixe balqonê ku dar dake, li wir zû zuha dibin. Di aliyekê de cilan bi darde dike û ji aliyên din jî li der û dora xwe dinêre. Çavên wê li ser du kesan disekine, di hafizeya xwe de digere, resmên însanên ku nas dike tîne ber çavê xwe, bes van du kesan nas nake. Bi xerîba dimînin, li dora apartmanê wek înasanên ku nizanibin wê çibikin doş dibin. Jinik dikeve şikê, ban lawê xwe dike, navê lawê wê ez Ahmed lêdikim, Ahmed sempatîzanê me ye, birayê Ahmed li eczexana Mahmûd Siyaxan kar dike. Wê gavê eczexana Mahmûd li meydana Qaniqûyê ye. Diya wî van du camêrana nîşanî Ahmed dike, dibêje lawê min ev du kes li dora apartmana me doş dibin, ez wan nas nakim, ev çi kes in? Ahmed jî li wan dinêre, serê yekî de şewqa Swêregiya heye. Diya wî dibêje were em ji polîs re telefonê bikin. Ahmed dibêje divê em piçek sebir bikin û baş fam bikin ku ev çi kes in. Ji polis re telefon nakin.

Beriya ku Ferîd bê kuştin diya Ahmed dibêje lawê min ka rabe, ji me ra nan bikire. Ahmet radibe dikeve rê, fîrûna herî nêzîk li hember mekteba navîn e, li kêleka yazixana Mahmûd Tektek e. Ji apartmana Ahmed ku Ferîd jî li wê apartmanê dimîne, heta fîrûnê bi peyatî qasî 15 deqîqe wext digre, çûyîn û hatin dora nîv saet digre. Ahmet diçe fîrûnê nan dikire û vedigere malê. Gava nêzîkayî li malê dike, ji dûr ve dibîne ku tiştek

bûye, dengên hawaran digîhîje Ahmed. Gava tê ber apartmanê êdî meselê fam dike. Ferîd kuştine. Ahmet nanê xwe dide diya xwe û rasterast tê komela me.

Em vegerin daîra Ferîd. Gundiyên ji bo muracata gubrê dipên radibin ser piyan, niha doba wan e, şewqên xwe ji serê xwe datînin, deriyê oda Ferîd vedikin û dikevin hundir. Ferîd radibe ser piyan, ji paş masa xwe tê pêş masê, destê xwe dirêjî wan dike, yekayek destên her sê gundiyan digre û ji wan re dibêje hûn bi xêr hatin. Ew jî dibêjin tu nav xêrê de bî. Piçek li hev şaş dibin. Rastî muhendîsekî wisa qet nehatine, li daîra dewletê muameleyek wisa ji wan re xerîb tê. Rûnin an li ser piya bisekinin nikarin biryarê bidin. Herwiha Ferîd wan keremî rûnişkandinê dike û bi xwe jî rûdine, hal û xatirê wan dipirse. Dibêje afû bikin, ez ê li ser erzûhala we di demeke kurt de biryarê bidim, bes divê ez niha biçim. Gundî jê re spasiyên xwe dikin, xatir jê dixwazin û diçin. Li pê wan Ferîd derdikeve der, berê xwe dide mala xwunga xwe.

Ereba resmî heye, lê Ferîd dixwaze bimeşe, bimeşe û bifikirê. Li rojhilatê ciyê karê wî de şûbeya Eskeriyê û qereqola cendirmeyan heye. Dibistana sereta Devrim Îlkokulu li paş daîra ziraetê ye, pêş dibistanê kuçeyaa Hurriyet û li aliyê din nexweşxana Swêregê heye. Di navbera ciyê Ferîd û nexweşxanê de dibistan û kuça Hurriyetê hene. Piştî gullebarandinê wê Ferîd bînin vê nexweşxanê.

Wisa xuya dike ku mêrkujên Ferîd ji berê de biryar dane ku wê yan li ber mala Ferîd yan jî li nêzîkî mala Ferîd, li Ferîd xin. Ciyê karê Ferîd ne musaid e. Bê guman dikarin li wir jî li Ferîd xin, bes îhtimala ku bên dîtin mezin e, muheqeq gelek însan wê

wan bibînin û cardin îhtimaleke mezin heye ku hinek însan bi dû wan kevin.

Navbera komela me û ciyê karê Ferîd li dora 200 metre ye, Lîse li paş komela me ye, cardin Mekteba Navîn (Ortaokul) li ser kuça Hurriyetê ye, 200 metre wir da ye. Paş nexweşxanê Lîseya Meslekê heye, pîraniya xwendevanên wir hevalên me ne. Xwendevanên van mekteban şoreşger in, pêşverû ne, gava dengê teqînê biçe wan wê dersên xwe berdin û bazdin ciyê ku deng jê tê. Endam û sempatîzanên komela me wan rojan li ser êstiriya rûdinin, di navbera Halk-Derê û hevalên me de şer derketiye, ji ber wê yekê her kesî guhên xwe bel kirine. Bi dengê teqînekê wê bazdin ciyê bûyerê. Herwiha ciyê karê Ferîd ji bo mêrkujan ne ciyekî musaîd e. Ciyê mala Ferîd musaid e, mala Ferîd li ciyekî wisa ye ku li wir zêde însan tune, yên hene cîranê apartmanê û neferên xaniyên terzî û karkeran e. Însanên ku li dû mêrkujan bazdin nîn e. Qereqolên polîsan di nava bajêr de ne, heta yek telefon bike, heta polîs li ereban siwar be û bê wir, kêmtir ewê nîv saet derbas be, heta wî çaxê mêrkuj xwe digîhînin Esmerçayirê.

Ferîd derdikeve ser kuça Hurriyetê, derbasî ser peyarêya li aliyê rastê dibe. Li baxçê Mekteba Navîn dinêre, zarok derketine tenefusê û ji xwe ra dilîzin. Dema xwe tîne bîra xwe, li wê mektebê sê salê wî derbas bûbû. Mudurê wan Şewketê Ruhayî bû, hundirê zarokan ji Şewket diqetiya. Mekteb û xwendevan jiyana wî bû. Bi roj ne bes, bi şev jî çoyê xwe dikir destê xwe qahwe bi qahwe digeriya. Gava rastî xwendevanekî bihata, bi lêdanê ew dişand malê.

Kesî nedixwest li kuçeyekê teng rastî Şewket were. Rojekê ez û Ferîd ji ber mektebê derbas dibin, wê gavê ez diçim dibistana

seretayî, mudurê xalo nas nakim, ez nizanim ew çi zebanî ye, carekê de Ferîd destê min girt û me her duyan wek kurgiyan xwe avêt paş dîwarê mektebê. Ferîd ji min re dibêje dengê xwe meke, heta mudurê min derbas dibe. Bes ez dixwazim mudurê wî nas bikim. Ez serê xwe piçekî bilind dikim û li mudur temaşe dikim, li belê newerêm nefesê bigrim. Şewket derbas dibe şûn da ez û Ferîd têr dikenin. Bi zar û zor em xwe ji lepên Şewket xelas dikin.

Ferîd digihîje qehwa Zifqar, berê, qehwa Zifqar li derveyê bajêr, di navbera petrola Ozurekya û sîloyên Ofîsê de bû. Wê demê qehwa Zifqar di navbera nivşên kevn û nû de dibe ciyekî girîng. Xwendevanên Swêregê yên li Stenbol û li Anqerê mektebê dixwînin, tatîla havînan da tên Swêregê û li wê qehwê bi xortên pêşverû re rûdinin û sohbet dikin. Qet ji bîra nakim havînekê ber bi êvarê em rûniitine, Mahmûdê Kaloyê Aresî ji Stenbolê hatiye. Mahmûd pakêta xwe ya malboro derxist, cixare îkramî me hevalan kir. Ez çewt nebim Deza Sefer cixara Mahmûd girt, filîtreya cixarê jêkir û cixara xwe vêxist. Mahmûd eciz bû, got cixara bê filître ji cixara bi filître xirabtir e, gava imkanên meriva hebe meriv cixarê bê filître nakşîne. Û gava em sosyalizmê dixwazin ev jî tê wê maneye ku em jiyaneke xweş û bi qelîte armanc dikin.

Zifqar li ser kuça Hurriyetê qahwexaneyek vekiribû, ew jî ketibû ber bayê siyasetê, ez bawer dikim xwe wek sempatîzanê maoîstan dihesiband. Du roj beriya kuştina Ferîd, hevalên Halk-Derê yên ku bi hevalên me re lec dikin li qehwa wî runiştine. Dema hevalên me ji wir derbas dibin qisan davên hev û şer dest pê dike. Remezan dimire û Zafer birîndar dibe.

Ferîd ji ber qehwa Zifkar dizîvire piyê rastê û dikeve kuça paş, ji wê kuçê meriv digihîje Kuça Seytana. Di van kuçana da Ferîd bi salan çûye û hatiye.

Ji mekteba navîn heta ku dibe muhendîsê ziraetê doraliya 15 sal wext derbas dibe, bes dikanên û dikançiyên li ser rêya Kuça Şeytana nehatine guhertin, dikana Qaqoyê Serabê hîn li ciyê xwe ye, niha pir caran xwarziyê Qaqo Osman li wir rûdine, dikana xalê Zulkîfê qundirecî li kêleka Qaqo ye, paşiya xaniyê Zilkif û xalo bi hev ve ye.

Ferîd beriya nîvroyê, bê ku bizanibê ew cara dawiyê ye li kuçên Swêrega xwe dimeşe, ji ber dikana bavê xwe ya kevn derbas dibe, çavekî davê dikanê, rojên wî yên zarotiyê tên bîra wî. Refên li ber sê dîwaran ji erdê heta asraxan bi cil û cawan tije bû. Dikan tu cara vala nedima, ji sibê heta êvarê yek dihat yek diçû. Dema du-sê kes tev dihatin li dikanê ciyên rûnişkandinê nedima. Şagirdên qehwa Hec Ûsub li pê hev ji mêvan û muşteriyan re çay danî. Yên ji apê Sefo caw dikirîn tu cara perê pêşin nedidan. Apê Sefo jî wek her carî deftera xwe ya deynan derdixist û deynên muşteriyan li wê defterê bi tarix û nav dinivîsand. Rojên Apê Sefo li dikanê derbas dibûn, li wir tenê caw nedifrot, pez dikirî, pez difrot, bi kirîbê xwe yê Aloyê Qerecdaxê re şirîkatiya xwe pêş dixist. Bes perekî zêde ji dikanê qezenc nedikir. Perê ku diket destê wî ji xwarina xwe û zarokên xwe re serf dikir. Gelek muşteriyan perê wî nedida û ew jî zêde bi dû perê xwe nediket. Kêfa Ferîd ji dikanê re dihat, gava dihat dikanê ji xwe re temeşayî însanan dikir, kuçên bajêr ji bo wî wek sînemayê bûn. Dema bîhna wî teng bibûya, diçû ba birayê xwe yê mezin. Xalo Evdo birayê wan ê mezin bû, neçûbû mekteb û medresê, ji xwe

ra bûbû terzî, dikana wî di nav çarsiya solan da û ji dikana Apê Sefo qasî sê deqîqan dûr bû. Xalo Evdo jî wek Apê Sefo şewqê xwe li serê xwe xwar dikir, ji aliyekî bi meqesê caw dibirî û ji aliyê dinê kilamên kurdî ji xwe re digot. Wî jî wek Apê Sefo pereyekî zêde qezenc nedikir, bê xwarin û vexarinê qezencek wî çênedibû. Dikana bavê Ferîd û dikana birayê wî zarotiya Ferîd neqişandin, bes ew nebû terzî û ne jî bû manîfatûracî. Qederê rêyek dinê dabû ber wî û ew di wê rêyê da dimeşiya.

Ji aliyê bajêr, li dawiya kuça Qeleboxaziyê, li ser piyê çepê qahwexana Emerê Sing hebû. Berê ciyê qahwexanê xana Bûbê bû, xalê Bûbê Ermenî bû, li xana xwe hesp û ker nal dikir û yek caran jî keran dixesand. Dû re mala xwe bir Stenbolê. Ferîd vê qahwê derbas dike, di nava Camiya Emer Axa re derbas dibe, gava digîhîje ber deriyê Eshet Odabaşî, bavê Ahmedê pismam, zarotiya Paşa û Saqip tê ber çavên wî. Rojekê xwe avêtibû ser pisqilêta Paşa û heta vir, heta ber deriyê apê Eshet ajotibû. Paşa û Saqip jî bi kêf û henek li dû wî baz dabûn. Cardin rojekê li hewşa apê Qado dilîstin, Paşa ji wî aliyê dîwar kevirekî çûk avêtibû û serê wî şikandibû. Rojên wan ê herî xweş û azad li nav rezê bavê wî derbas dibûn. Gava tirî çêdibû, Apê Sefo li kera xwe siwar dibû, Ferîd û xwarziyên wî jî diketin dû Apê Sefo û diçûn nav rez. Di nav mêwan da bera hev didan, bi hev re gulaş dikirin. Apê Sefo tiştek nedigot, kêr di destan de, fîtika xwe lê dixist û gûşiyên herî xweşik jê dikir û dixist nav selikê.

Ev bîranînên zarotiyê dilê Ferîd sivik dike. Ji xwe re dibêje, belê em di warê siyasî de dujminên hev in, gor nihêrtinên me, gor bîr û baweriyên me divê ez vê xeberê negihînim wî. Bes ez ê çawa vê xeberê nedim wî? Gava tiştek bibe wê xwunga min ji

min re nebêje "Ferîd, te çima xeber neda me? Te çima em haydar nekirin?" Wê gavê ez ê ji xwunga xwe re çi bibêjim? Ez ê çi xweliyê li serê xwe kim?

Li Wêranşarê gava min êrişî Paşa kir, ma wî jî ji min re negot meyê ser min, tu xalê min î, ez naxwazim li te xim. Û ev gotinan di huzûra hemû hevalên xwe de kiribû. Niha jî ez wisa dikim, gava hevalên min pê bihese ku min xeberek wisa dayê Paşê, wê xezebê li min bibarînin, min bi nedurustiyê îtham bikin, qîmet û rûmeta nîşanî min didin ewê paş da bigrin. Di warê siyasî de ez xwe bavêjim kîjan alî, ez ê nikaribim ji vê rewşa xwe ra îzehetekê bibînim lê di warê mirovatî de ez nikarim bêdeng bimînim, gava çi heval, çi mirovê meriv di bin talûkeyekê de be, bêdengmayin ne rast e, em hemû zarokên vî welatî ne, rîçên me, diroka me yek e. Di bingehê xwe da xebata me jî yek e. Em hemû çi dixwazin? Jiyanek bê zulum û zordarî, jiyanek serfiraz, azad, ne kêm û ne jî zêde. Herwiha ez di wê qeneatê da me ku ez tiştekî xirab jî nakim. Gava rojekê hevalê min bi vê bûyerê bihesin hêviya min ew e ku wê fam bikin.

Di nav van xeyelan da Ferîd digihîje mala me, ji deriyê hewşê dikeve hundir, diya min li hewşê ye, hewşê dimale. Ferîd dibêje:

- Hekê tu çi dikî?
- Ferîd! Xêr e, tu çi digerî?
- Wele hekê min xeber girtiye ku wê li Paşê xin.

Wê şevê ez neçûme mal, diya min nizane ez li ku me û bi çi mijûl dibim, xew neketiye çavên wê, bê xew û bê huzûr e, qisên xalo Ferîd dilê diya min diqetîne, heş li serê wê namîne. Bi Ferîd re hêrs dibe, jêra qisa dike. Ferîd dixwaze wê sakîn bike, dibêje, qiyametê rameke, min xeber girtiye ciyê Paşê baş e, metirse.

Diya min sakîn nabe, Ferîd divê biçe kar, diya min sola xwe dixe lingên xwe, çarşeva xwe dikşîne serê xwe û bi dû Ferîd dikeve. Gava digîhjin ber firûna Hec Ebbas, Ferîd dibêje ez birçî me, radibe pariyek nan ji firunê dikire, perçeyekî dide diya min û perçeyek jî bi xwe dixwe û dimeşin. Xalo bi rê ve diya min sakîn dike, li ber mala xalê Miçoyê Ebasan diya min vedigere mal. Diya min cara dawiyê birayê xwe dibîne, haya wê tune ku ber bi êvarê Ferîd wê were kuştin.

**22 Çiriya Paşîn, Misto ji gundê xwe bi rê dikeve.**

Piştî sala 74an li Anqerê DDKD ava dibe, Misto di nava DDKDê de aktîf dixebite, di kar û barê belavok belakirinê da, civîn û mitînga da Misto her dem li pêş e. Ne tirs û ne jî mirinê nas dike. Wê demê di nav Anqerê de belavok belavkirin, mitîng çêkirin karê her camêrî nîn e, ulkucî wek gurên har û birçî li dû şoreşgeran digerin, rojê carekê li pêşverûyan gulle dibarînin, ji çend rojan carê li ser riyên mekteban xwendevanek tê kuştin.

Misto ji gundekî Hîlwanê ye, hevaltiya wî û Ferîd heta deqîqa Ferîd tê kuştin dom dike. Roja ku li Ferîd gulle tên barandin Misto jî li ba Ferîd e, ew li aliyê çepê erebê dibe şahidê gullebarandina ser Ferîd.

Wê sibehê gava li gund ji nav ciyê xwe radibe, ew nizane ku dê çi bê serê wî.

Hîlwan di navbera Swêregê û Ruhayê de ye, riya Ruhayê di nav Hîlwanê re derbas dibe. Riya asfalt bajêr dike du perçe, her perçek dikeve aliyekî. Xaniyên Hîlwanê ji heriyê çêbûne. Van salên dawiyê xaniyên beton jî roj bi rojê zêde dibin. Xelkê

Hîlwanê û gundên li dora Hîlwanê, xwe ne ji Swêregê û ne jî ji Ruhayê dihesibînin, li belê tesîra Swêregê û Ruhayê her dem li ser Hîlwanê hebûye. Qedera Hîlwanê bi babetekî bi Swêregê ve hatiye girêdan. Di warê civakî û siyasî de têkîliyên navbera Hîlwan û Swêregê de gelek bi hêz e. Nivşên şoreşger vê têkiliyê piçekî din jî xurt dikin.

Misto ji xewê radibe, taştêya xwe dixwe û derdikeve hewşê, kursiyekê dikşîne bin xwe, berê xwe dide tavê û rûdine. Neferên malê li ser piyan e, lê belê kes Misto narehet nake, ew dizanin ku heta Misto cixara xwe ya sibê nekşîne heş nayê serê wî. Cixara xwe kişand şûn da meriv dikare bi wî re qise bike.

Zarotiya Misto di nava gund de derbas dibe, sînorên dinyaya wî li dawiya erdên gundê wan xelas dibe. Roja ku ji bo xwendinê ji gund derdikeve, dinyaya wî fire dibe, sînor ji ber wî radibin. Li Anqerê ji her bajarên welatê me însanan nas dike, bi wan re dibe heval, bi wan ra bajar bi bajar digere. Yên di wê demê de di nav DDKDê de kar dikin, di pêşerojê de dibin serokên grubên çep û welatperwer. Misto hemûyan nas dike, bi hemûyan ra radibe û rûdine, lê herî dawiyê qedera xwe û Ferîd di karê siyasî de dike yek. Di vê yekbûnê de çiqas dîtinên siyasî û çiqas şexsiyeta Ferîd rolê dilîze tenê Misto bi xwe dizane.

Misto cixara xwe vêdixe, çend nefesan li ser hev dikşîne, duxana ji pozê wî derdikeve, li hewa piçek doş dibe û dû re dikeve ber bayê û winda dibe. Bi bayê ve dengê erebên diçin Ruhayê û Swêregê heta ber malê tê. Çûçikek tê li ser dara di nav hewşê de vedinişe, li ser gulînçekên darê zêde pel nemane, Misto serê xwe radike li çûçikê dinêre, duxana cixara xwe ber bi çûçikê puf dike, çûçik difire û diçe rêya xwe.

Jiyana wî jî kêm zêde wek çûçikê ye, di nav van sê-çar salan da ji serîkî welat heta serîkî din wek çûçikê doş dibin, yek caran bi Ferîd re, yekcaran jî bê Ferîd diçin bajaran, gundan, însanan nas dikin, hevalên nû ji xwe ra çêdikin.

Reşo û Misto wek brayên cêwî ne, li Anqerê her tim bi hev ra ne. Gava Misto û Ferîd di nav Kawayê de cî digrin, Reşo jî li ba Misto ye. Wê rojê daweta Reşo û Nedretê dê li Diyarbekîrê çêbe, daweta zewacê nîn e, ew ê dergîstî bin. Ji ber wê yekê Misto dê biçe Diyarbekîrê.

Misto ji ser kursiya xwe radibe, ji diya xwe û neferên malê xatirê xwe dixwaze. Ji diya xwe ra dibêje ez ê derkevim ser rê û biçim Swêregê û ji wir jî bi dolmişekê biçim Diyarbekîrê. Xebera diya wî heye ku nîşana Reşo ye, dibêje bi silametî biçe lawê min. Misto derdikeve ser rê, li dolmişekê destê xwe bilind dike, dolmîş disekine, Misto dikeve nav dolmîşê û li kêleka şofêr ciyê xwe digre. Dolmîş hedî hedî ji ciyê xwe radibe, li dû xwe bîhna mazotê û duxaneke reş berdide û ji ber çavan wenda dibe.

**22 Çiriya Paşîn, Ado û Huso ji Diyarbekîrê bi rê dikevin...**

Ado û Huso bi salan berê de hevalên hev in, gava hevaltiya wan dest pê dike, bi siyasetê ve mijûl nabin. Di Lîseya Swêregê de xwendevan in. Bavê Huso ji bajarê Erûhê ye û li wir di tekelê de kar dike. Însanek bi namûs û şeref e, ji milletê xwe, ji xelkê xwe hez dike, welatperwer e. Hukmat wî surgûnê Swêregê dike. Huso li Swêregê dest bi lîseyê dike û bi Ado re dibe heval û hogir.

Gava derbasî sinifa sisêyan dibin, cardin bavê Huso surgûnî bajarekî dora Afyonê dibe. Hevaltiya Ado û Huso jî herwiha qut dibe. Huso li bajarekî xerîb sinifa sisêyan dixwîne, bes ji mehekî

zêdetir namîne. Piştî mehekê cil û cawê xwe berev dike û bi destûra bavê xwe dikeve ser riya Swêregê. Wê gavê Ado bi merivên xwe re li xaniyekî nêzî dibistana yekemîn Gazî Paşayê dimîne. Dibêje, me nihêrt şevekê deriyê me lê ket, me derî vekir ku çi bibînin, Husoyê me li ber derî sekiniye. Huso dibêje, "Ez vegeriyam, ez ê bi we ra liseyê xelas bikim." Wisa jî dikin, her du tev lîseyê xelas dikin û her du tev dikevin imtihana universîteyê. Ado li Anqerê dikeve tibê, Huso bi ser nakeve, li Anqerê dest bi dersxanê dike. Sala duduyan ew jî dikeve tibê. Salek şûn da ew û Ado neqla xwe radikin Diyarbekîrê, li Diyarbekîrê li Baxlera bi hevalekî memûr re di xaniyekî de dimînin. Pir naçe hindik naçe Ado dizewice, ew û xanima xwe jı xwe re daîreyekê li mehela Şhîtlixê kirê dikin. Huso jî li Ofîsê daîreyekê kirê dike.

Şeva 22ê Çiriya Paşîn, di saetek dereng de hinek li cama paca mala Ado dixin, Ado diçe pacê, zilamek dibêje ez cîranê te me, jana jinikeke hemîle rabûye, ka were kerema xwe re em bi ereba te wê bibin nexweşxanê. Ado wek her dem bi tedbîr e, di nav ereba xwe da ji bo demançê ciyek çêkiriye, demança xwe li wir vedişêre. Ji zilam re dibêje hûn biçin serê koşê û li benda min bin, ez ê cilê xwe li xwe kim û bêm. Ji ber ku Ado bi guman e, nas nake ku ew zilam çi kes e, ji ber wê yekê beriya ku biçe ba zilam, dixwaze demança wî li ber destê wî be.

Elelecele cilên xwe li xwe dike, ji xanima xwe xatir dixwaze û dadikevê jêr. Deriyê ereba xwe vedike, li paş dîreksiyonê cî dide xwe, demança xwe ji ciyê dizî derdixe û dixe ber pişta xwe. Li serê koşê, zilamê ku li paca wan xistibû û jinikek hemîle li benda wî ne. Gumanên Ado winda dibe, zilam û jinikê bi silametî digijîne nexweşxanê, ji çend doxtorên nas rica dike ku ji jinika reben re alîkar bin.

Ado nîvê şevê vedigere mal, demançe li pişta wî derdikeve daîra xwe, demançê dike bin balîfa xwe û radizê.

Sibê ew û xanimê wê biçin Ferîd, Ruhsar û Yekbûnê ji Swêregê bi ereba xwe bigrin û bînin Diyarbekîrê. Ew jî wek Misto wê biçin daweta Reşo. Ferîd çend roj beriya ji Ado re dibêje hatina te hewce nake, em li dolmîşekê siwar dibin û tên, bes Ado israr dike, dibêje, em ê werin we bigrin. Êdî Ferîd dibê-je baş e, ez ê li benda we bim.

Wê rojê, Ado sibê zû ji xewê radibe, taştêya xwe dixwe û diçe sûkê, demekê li nav sûkê dizivire û dû re diçe mektebê, li wir rastî Huso tê. Ado ji wî re dibêje, ez ê nîvrokî biçim Swêregê û Ferîd bînim. Wê gavê Huso dibêje ez jî bi te re têm.

Beriya saet donzdah diçin mala Ado, Ado ji xanima xwe re dibêje planê me hat guhertin, Huso dixwaze bi min re were, ger tu eciz nabî ez û Huso em ê biçin Swêregê. Xanim dibêje tiştek nabe, bi silametî biçin, oxira we ya xêrê be.

Dora saet donzdeyê nîvro Ado û Huso ji Diyarbekîrê derdikevin. Qasî bîst kîlometreyî ji Diyarbekîrê dûr ketine, Ado ji carekê de ferq dike ku demança xwe li bin balîfê xwe ji bîra kiriye. Dibêje, Huso min demança xwe li mal ji bîra kiriye. Huso dibêje, de tişt nabe, em naçin şer, em ê Ferîd bigrin û vegerin. Ado paş da venagere lê dilê wî jî tam rehet nîn e, her dem demança wî di nava erebê de ye, xwe elimandiye, divê demança wî li ber destê wî be. Bes şeva çûyî gava ji nexweşxanê vedigere, ji bîr dike ku demançê di nava erebê de bihêle, demançê dixe bin balîfa xwe û li wir ji bîr dike.

Saet navbera yek û yek û nîv digîhîjin ciyê karê Ferîd. Ferîd li daîra xwe karê xwe dike, ji wan re dibêje karên min xelas

nebûye, ger hûn biçin sûkê û piçekî bizivirin, ez ê karê xwe xelas bikim û li benda we bim.

Di wan rojan da rewşa Swêregê bê huzûr e, Ado bangî Ferîd dike û jê dipirse, ka talûkeyek hember wî heye an tune? Ferîd ji Ado re dibêje, na, ji bo min, ji bo jiyana min talûkeyek tune, ji bo xatirê min tedbîr girtin ne hewce ye. Ado bi gotina Ferîd baweriya xwe tîne. Ado û Huso diçin sûkê, zikê wan birçî ye, diçin loqanta Îsmail. Loqanta Îsmaîl li ser kuça Hurriyetê ye, dolmîşên Diyarbekîrê ji kêleka loqantê radibin.

Misto ji gund nuh gîştiye Swêregê, wê li dolmîşê siwar be û biçe nîşana Reşo, xebera wan ji hev tune ye. Gava Misto ji ber loqantê derbas dibe, Ado û Huso wî dibînin û bangî hundir dikin, Misto jî zikê xwe têr dike. Ado ji Misto re dibêje dev ji dolmîşê berde, di ereba min de ji te re jî cîh heye, em hemû tev biçin. Misto dibêje, baş e.

Her sê heval nanê xwe dixwin, perê xwe didin û ji loqantê derdikevin. Ereba Ado Renoyek kesk e, Huso li ciyê xwe, li pêşiyê rûdine, Misto li paş Ado cî digre, bi rê dikevin û diçin ba Ferîd, karê wî xelas bûye, derdikevin der, Ferîd li paş Huso, li kêleka Misto rûdine, saet li dora siseyan e. Sê-çar deqîqan da digîhîjin ber mala Ferîd. Ferîd dibêje hûn piçekî li wir bisekinin, ez derkevim jor Ruhsar û Yekbûnê bînim. Ferîd bi gavên sivik û lez dikeve hundir, ji nêrdiwanan derdikeve jor, li zengilê derî dixe, Ruhsar derî vedike. Yekbûn xwe davê himêza bavê xwe, ew bêsebir e, beriya ku Ferîd were malê, xwe hazir û nazir kiriye, li erebê siwarbûnê hez dike, hele gava bi bavê xwe re li erebê siwar dibe ji kêfan difire. Wî rojê heta bavê wê tê mal belkî pênce carî ji diya xwe dipirse, ka bavê wê ewê kengê bê mal.

Gava Ferîd tê mal êdî teqeta Ruhsarê nemaye ku bersîvan bide Yekbûnê. Ruhsar dibêje Ferîd, tu û Yekbûn herin jêr, ez jî li pê we dadikevim.

Berê Ado ber bi deriyê apartmanê ye. Yek kes ji apartmanê derdikeve, li serê wî şewqeyekî Swêregê heye, eniya wî fire, biryên wî qalind û sifetê wî esmer e. Simbila xwe qurisandiye. Ew camêr ji derî derdikeve, li ser piyê xwe yê rastê dizivire û ber bi paş apartmanê diçe.

Li pê wî, Ferîd ji apartmanê derdikeve, Yekbûn li pêş wî ye. Adem û yên din bala xwe dane Yekbûnê. Yekbûn sê sal û nîv e. Ferîd û Yekbûn digîhîjin ber erebê, Ferîd dixwaze, Yekbûn li pêş, di himêza Huso de rûne, lê belê Yekbûn dike mizmiz û digirî, ew naxwaze li ba Huso rûne, dixwaze li himêza bavê xwe rûne.

Ruhsar hîna ji apartmanê derneketiye, carekê de reqîna demançê dest pê dike. Ado çavên xwe dizivirîne ciyê ku deng jê tê, camêrê ku bîska berê zivirîbû paş apartmanê niha, ji aliyê dinê derketibû pêş û gulleyan li Ferid dibarîne. Paşiya Ferîd bi mêrkuj de ye, dora heşt gulleyan li ser pişta Ferîd dibarîne, Ferîd di ciyê xwe de dikeve erdê, Huso jî ji koltixa xwe ya pêşî dikeve erdê.

Misto ji Ado dipirse, ka sîlehek heye an tuneye? Ado dibêje na. Misto û Ado xwarî erdê dibin û bi kulmên xwe çaqilên kêleka rê digrin û davêjinn qatil, qatil li wan dizivire û çend gulleyan jî berdide wan, ew xwe davên erdê. Gulleyên li wan tên barandin, rastî baxaja erebê tê.

Qatil, di navberan xaniyên karkeran û Mekteba yatilî de, ber bi Esmerçayirê ve baz dide. Ado û Misto xwe davên ser Ferîd û Huso, çi tê serê Yekbûnê, ne Ado û ne jî Misto dizane. Ji Ferîd deng dernakeve, ji serê Huso xwîn tê, Ado dibêje qey wî ji serê

xwe derb xwariye, bes dû re fam dikin ku, gulleyek li erebê ketiye û perçeyek hesin ji qaporta erebê jê bûye û li serê wî ketiye.

Misto Huso dike himêza xwe û li qoltixên dawiyê de rûdine, Ado jî Ferîd li ser qoltixa pêş dirêj dike, serê wî li ser çoga xwe ya rastê datîne û destê xwe yê rastê dide ser sifetê Ferîd, bi destê xwe yê çepê erebê dajo. Nav du deqîqan da digihîjin ber nexweşxanê, gava Ado, Ferîd ji erebê derdixe wî dizivirîne, wê gavê dibîne ku sînga Ferîd di xwînê de maye. Gulleyên li pişta wî tên barandin ji sînga wî derketine.

Ruhsar tiştekî nabîne, gava Ruhsar derî digre û ji nêrdiwanan ber bi jêr dimeşe, dengê gulleyan digîhîje wê, ew dibêje qey hinek mîx di texteyan de dikutin, di carekê de çend pîrek bi qîrîn û hawar ji nêrdiwanan ber bi jor hildikişin, Ruhsar bê huzûr dibe lê cardin tiştekî fam nake, gava çavên wê li atqiya Ferîd a di destê jinikekê de dikeve, dinya wê bi ser wê de tê xwarê.

Ruhsar laşê Ferîd nabîne, Ruhsar dibêje Paşa, ez yek caran dixwazim û hêvî dikim ku ev serpêhatiya min ne rast e, hemû xewnên şevan e, hevalên Ferîd ew veşartine û rojeke xweşik ewê Ferîdê min ji min re bînin.

Bavê min gava Ferîd tê kuştin bi rê ve ye, ji aliyê Ruhayê bi ereba xwe ve tê Swêregê, li gel bavê min hevalekî wî heye, yê erebê dajo birayê min e. Bavê min li ber yazixana xwe dadikeve. Bîskek şûn da xebera kuştina Ferîd digîhîje bavê min.

Bavê min baz dide mal, gava dikeve hundirê enûgê hawarek ku dilên dayik û xwûnga perçe dike ji xwe derdixe. Qîrin û hawarek dikeve hewşa me, orta rojê çav çavan nabîne, kî çi dibêje kes fam nake. Diya min xwe davê ser bavê min, ew dibê qey

ez hatime kuştin, bavê min dibêje Sadê! Sadê! Ferîd kuştin! Êdî diya min xwe wenda dike, çi tê devê wê ji bavê min re dibêje. Qurçimyo! Pergala te bela be, dilê te niha rehet bû? Te digot Ferîd û Ferîd, niha Ferîd çû, em ê çi xweliyê li serê xwe kin?

Bavê min xwe ji însanan pir zû aciz dikir, bes herî zêde xwe ji rehmetiyê xalê Evdî û xalo Ferîd aciz dikir. Gor wî ev du kesan zarokên wî û zarokên xelkê ji sêrî derdixistin. Diya min ev dizanîbû, ji ber wê yekê nifirên herî giran lê dikirin. Bavê min li pêş, diya min li pey wî berê xwe didin nexweşxana Swêregê û baz didin. Bi rê ve dakê Kejo û abla Nazo, diya Ahmedê pismam, bi dû diya min dikevin. Gava ji deriyê nexweşxanê dikevin baxçe, çavê diya min li Husênê Bro dikeve, diya min ji Husên dipirse, ka Ferîd sax an ne sax e. Husên dibêje bi Ferîd tiştek nebûye diya min, piçek lingên wî birîndar bûye, ewê wî bînin malê. Lê belê diya min zû fam dike ku Ferîd çûye, naxwaze dakê Kejo diya Ferîd, biçe hundirê nexweşxanê.

Diya min hêsiran nabarîne, wî gavê zexm û xurt dibe. Ji diya xwe ra nabêje Ferîd mirî ye. Diya xwe û hinek pîrekên din li erebeyekê suwar dike û tîne malê.

Dinya li diya min reş dibe, beriya Mehemedê wê û niha jî Ferîdê wê, çûkê wê, şîrîn û şekirê wê, tenbûrvanê delal, hewalbend û rêberê xelkê me yê reben, li nexweşxana Swêregê çavê xwe digre. Yê li Ferîd gulleyan dibarîne, zarokê erdê me ye. Zimanê wî, jiyana wî, derd û kulên wî kêm zêde wek ên Ferîd in.

Li esmanê bajêr stêrk diçirûsin, ne parçekî ewr û ne jî baran heye. Şevek ji şevên payizê, ronî û germ. Însanên ku Ferîd nas dikin, hez dikin, ji serî heta bi nenûkên lingan bûne agir û dişewitin, li hev dipiçikin û digirîn.

Piştî çend saetan cenazê Ferîd digihîje mal. Bi hatina cenaze re qiyamet radibe, qîrîn û hawara însanan li esmanê Swêregê wek brûskan dişîrqe. Swêreg hêsiran dirijîne, kal, pîr, zarok û zêç, her babet însan, li kuçan, li xaniyan digirîn.

Yên ku Ferîd dîtîne, yên wî nas dikin, hevalên wî, dost û nasên wî, nedikarin qehra dilê xwe û ne jî hêsirên çavên xwe veşêrin.

Di wê qiyametê da dest û ling li hev dikevin, însan li xwe şaş dibin, nizanin çi bikin, nizanin çi bibêjin. Apê Sefo jî di wê rewşê de ye, ji agir û qiyameta dilê xwe nizane çi bike. Diçe bi pêsîra pîrika min a Bêzê digre:

-Meye vir! Meye vir!

-Yê lawê min kuşt torinê te ye, Paşa ye! Û tu serda jî tê şîna min!

-Neviyê min kî ye? Torinê min kî ye? Ya sitar Sefo! Torinê min, torinê te ye. Em ê tiliya xwe çawa di çavên xwe ra kin?

Dengê Bêzê naçe guhên apê Sefo, kî jê re çi dibêje fahm nake, agirê dilê wî hiş li serê wî nehîştiye. Gotina xwe dom dike, Paşa lê xistiye..

Êdî Ruhsar nikare li ciyê xwe rûne, radibe ser xwe, diçe yaxa apê Sefo digre û dibêje:

-Paşê lê nexistiye! Paşê lê nexistiye! Dev mavê Paşê! Ji xwe ra wek dinê bifikire, heşê xwe bîne serê xwe, Paşa, Paşayê te ye.

-Wa...? Wa...?

-Wele ez rast dibêjim, yaxa jinikê berde!

Bê lome be, kezeba apê Sefo şewitîbû.

## Dûre çi dibe?

Li vir dixwazim li ser çend noqteyan bi kurtasî dîtinên xwe bêjim.

Yek; ji kuştina Ferîd heya nuha hinek însanên siyasetmedar û ronakbîrên kurd hîna jî xwe ji zîhniyeta eşîr û eşîrtiyê xelas nekirine, dibêjin "Mala Brodireja" xwe bêdeng kir.

Ez dibêjim têkiliyên xurt û zexm ên eşîrtiye di nav mala Brodirêja de tunebûn û tunene. Min bi çavên xwe têkiliyên wan dîtine û jiyame jî. Bes navnîşanê wan ê kurdî xurt e. Salên ku ez û Ferîd mezin dibin, bav û kalên me, dê û xwungên me bi kurdî dipeyivin, çîrok û kilamên xwe bi kurdî dibêjin, şîn û dawetên xwe bi kurdî dikin. Tiştê ku vê malê yan vê malbate balkêş dike ev xusûsiyet e.

Di xortaniya xwe de em dibin kurdperwer, çep û sosyalîst, em dibin parçeyekî miletê kurd, dibin neferên serwext û zane. Êdî tevgera me, fikrên me, bîr û baweriyên me li ser têkiliyên kurdperwerî û rengên siyasî ava dibin. Loma em her yek dikevin nav

rexekî: Ez di nav DDKD de cî digrim, Ferîd di nav KAWAyê de, Mehemed di nav KOMALê de. Encama me va ye. Nuha gava hin siyasetmedar yan ronakbîr dibêjin "Mala Brodirêja" ez ê ji sergêjên wisa re bersiveke çawa bidim?

Didu: Ez kitêba "Xalê min Ferîd" wek sawciyekî, wek hakimekî, serekeşîrekî yan wek siyasetmedarekî nanivîsim. Ferîd bi kêmasî û qusûrên xwe ve xalê min bû, min jê hez dikir; ji bo min ew stêreka şevên tarî bû. Siyasetê em kirin neyarên hevdu. Min xwest bi nivîsarên xwe ez wê neyartiyê bikujim, nêzîkî wî bim, jê efû bixwazim û jê re bibêjim: Binêre, ez bi zimane te dinivîsim, min bi saya heval û hogirên kurdperwer ên wek Sîno Xurşîd kilam û helbestên te bi dest xistin û bi cî kirin, min tu ji bîr nekir û hêviya min ew e ku xelkê kurd jî te ji bîr neke. Dibe ku siberoj bi navê te mektebek ava bibe, kurd navê te li kuçeyekî an li parkekê bikin, li ser jiyana te fîlîmek çêbe, kilamên bi deng û sedayê te li hemû Kurdistanê belav bibin. Însanên binamûs û kurdperwer, însanên ku hurmeta wan ji tarîxa xwe re heye û qîmet didinê, wê li te û li hevalên din xwedî derkevin. Li hember qatilan wê we yekayek vejînin. Rojên ku zarokên me li dibistanan jiyana we û têkoşîna we bixwînin wê werin. Û bi vî hawayî em ê bersiva qatilên te bidin û bi vî hawayî em ê "heyfa" te bigrin.

Sisê: Di pirsa kuştina Ferîd de gelek tişt derketine holê

-Nivîsara Çetîn Gungor (1)

-Îtîrafên H. Huseyin Karakuş (2)

-Gotinên Serhat Bucak (3)

-Nivîsara Îbrahim Kureken ên di "Kurd Info" yê de. (4)

-Gotinên Ali Yaverkaya (5)

Bes înformasyonek ku vê sala dawiyê derketiye hole, ez beriya 27 salan, roja ku Ferîd tê kuştin, êvarê ji Ado (6) û Îbrahim Kureken re pêşkêş dikim.

Ez vegerim ser roja 22yê Çiriya Paşîn a 1978an.

Gava xebera gullebarandinê digihîje me, ez li komelê me. Saetek derbas nabe Ahmedê cîranê Ferîd (7) tê ba min. Dixwaze behsa wan du kesên xerîb bike, du kesên ku wî û diya xwe li dora apartmanê dîtibûn. Ez dibêjim baş e, eşkalên wan ji min re bêje. Eşkalê ku Ahmed tarîf dike weha ye: Xortekî bejna wî normal, eniyekî fire, similê qusandî, sûretekî esmer, briyên qalind û reş, li serê wî şewqeyekî Swêregê heye. Ahmed nikare eşkalê zilamê din tarîf bike.

Ev tarîfa ku Ahmed kiriye û kesên ku min sibê li komela me dîtine wek hev in. Ez matmayî dimînim. Ji Ahmed careke din dipirsim, lê tarîfa wî nayê guhertin. Zilamên ku min û Ahmed dîtine wek hev in, eşkalên wan hevdu digrin. Çend roj berê ev her du kes li kuça Hurriyetê tên dîtin. Yê wan dibîne merivê min e. Li ba wan zilamek ji Sêwregê heye. Zilamê ku bi wan re zilamekî siyasî ye. Dikevin dukana merivê min û li wir tiştekî dikirin. Ez gava vê nivîsarê dinivîsim, ji wî merivê xwe re telefon dikim û dixwazim careke din li wî guhdarî bikim. Ew dibêje min tiştek wisa ne dîtiye û ne gotiye. Îhtimal e ku nayê bîra wî, bes ez bi hafiza xwe bawer im. Roja ku Ferîd hat kuştin, ez bi gotina wî dibim şahidê vê înformasyonê. Divê em vê înformasyonê bidin hevalên KAWAyê. Ferîd heval û hogirê wan e, serekê wan e, ji her kesî zêtir heq û huqûqê wan heye ku ev înformasyon têkeve destê wan. Ez wisa difikirim û wisa biryarê didim.

Êvara 22ê Çiriya Paşîn, roja ku Ferîd tê kuştin em li mala Qerto, li xaniyê wan ê ku li paş şirketa Elektrîkê nuh ava kiribûn, berhev dibin. Ez, Qerto û Ednan ji DDKDê û ji KAWAyê jî Îbrahîm û Ado. Ez ji wan re xeber dişînim, ew dibêjin baş e û tên mala Qerto.

Ez di huzûra cemaetê de behsa wan du kesan dikim û eşkalê zilamê bi şewqê Sêwregî ji wan re tarîf dikim. Ado ne kêm û ne zêde dibêje. Tarîfa te rast e. Piştî ku Ado tarîfa min tesdîq dike, ez dibêjim şaş fam nekin, ez naxwazim ji we re bibêjim filankesan Ferîd kuştiye, lê ev du kes çend roj berê li kuça Hurriyetê bi zilamekî siyasî re hatine dîtin. Înformasyona ku me dixwest hûn bizanibin ev e, êdî hûn çawa difikirin û çawa hereket dikin, mesela we ye.

Em bêyî van gotinan zêde tiştekî nabêjin. Gora qenaeta me ya wê gavê, Ferîd hevalê wan e û divê ev malûmata hanê bigihîje wan. Civîna me ya kurt xelas dibe. Em radibin.

Û ji wê rojê heta ku ez dest bi kitabê dikim, têkilya min û Ado çênabe. Gava ez dest bi vê kitabê dikim, beriya her kesî ez diçim ba Ado. Demeke dûr û dirêj derbas bûye, gelek heval hatine guhertin, gava ez li wî dinêrim, ez dilekî pak û zelal, dilekî henûn û kurdperwer dibînim. Ji ber vê yekê kêfa min tê. Eşkalê ku min ji wî re beriya 27 salan behs kiribû, ez careke dinê behs dikim. Ez dixwazim careke dinê ew wî eşkalî teyîd bike. Ew dibêje, Paşayê ku li Ferîd gulle barand, heta ku ez bijîm ji bîr nakim. Eşkalê ku tu behs dikî û camêrê ku min dîtiye yek e. Di vî warî de şika min tune. Li gel min hevalek heye, ew jî dibe şahidê vê gotinê. Em ji hevdu xatir dixwazin û radibin. Beriya ku ez ji Diyarbekîrê veqetim, careke din wî dibînim.

Gava ez di hefsa Diyarbekîrê de radikevim, ji doza PKKê H. Huseyin Karakuş dibe îtirafçî. Di îtirafa xwe de dibêje me Ferîd daye kuştin û yên emrê partiyê haniye cîh Emin Dal û Ali Yaverkaya ne. Xeber balkêş e, bes ji bo min têr nake, divê ez rismekî Emin Dal bi dest xim. Bes çawa? Herî dawiyê rehmetî Emin Yavuz ji min re dibe alîkar. Beriya ku em werin hefsa Numre-5 (5 Nolu Cezaevi), ez û Emîn di hefsa yekemîn de di qawîşekê de dimînin. Di lêpirsînê de bi zora lêdanê ji PKKê re çêr kiribû, PKKê jî ew tecrîd kiribû. Ebdekî Xwedê bi wî re nedipeyivî, kesî xwe nêzîkî wî nedikir. Carna ez pê re rûdiniştim, me suhbet dikir, di demeke kin de em bûn dostên hev. Di hefsa pêncemîn de PKKê efû îlan kir, Emin jî ket ber efûyê, dûre ket rociya mirinê û wefat kir. Xwedê wî bi rehma xwe şa bike.

Li ba girtiyekî Hîlwanî rismekî Emin Dal heye, Emin Yavuz bi soza risim li xwedî vegerîne, ji min re tîne. Ez li wî rismê biçûk dinêrim û teslîmî Emin Yavuz dikim. Camêrê ku roja gullebarandinê tê komela me ew e. Tu şika min namîne. Di wî rismî de jî simêlê wî qusandî bûn. Bes niha piştî 27 salan ez rismekî din bi dest dixim, cardin di wî rismî de jî her tişt hevdu digre. Bes di vî rismî de Emin Dal bê şewqe ye û simêlê wî nequsandî ye.

Di gotinên xwe yên Internetê de Ali Yaverkaya dibêje, "Yê Ferîd Kuştiye Emin Dal e, ne ez im."

Gor min Alî rast dibêjê, gava Emîn gulleyan li ser Ferîd dibarîne tenê ye, li ba wî kesekî xuya nake. Dema Emin Dal sibê zû tê komela me, li ba wî zilamekî din jî heye, cardin li dora apartmana Ferîd, Emîn Dal û zilamekî din tev tên dîtin, lê gava gullebarandinê Emin Dal tenê ye. Zilamê ku li ba Emîn Dal tê dîtin kî ye? Gava gullebarandinê ew ku da winda dibê?

Ez naxwazim li Alî neheqiyan bikim, lê, dibe ku ew bikaribê bersiva van sewalan bide.

Rojên pêş ew ê vê noqtê jî zelal bikin.

Hêviya min ew e ku yên biryara kuştina Ferîd didin, bi kêmasî ji wan yek kes bi cesaret û bi mêranî rabe ser xwe û vê bûyerê eşkere bike, mijûyê xwe, wicdan û ruhê xwe azad û sivik bike.

Meseleya din jî ev e, tiliya Bucaxiyan di kuştina Ferîd de tune. Li dû kuştina Ferîd, Bucaxî xeberê dişînin ku tu eleqeyekî wan bi vî karî tune û dixwazin werin şîna Ferîd rûnin. Hevalên KAWAyê daxwaza wan maqûl dibînin û ew tên şîna Ferîd.

Û ji aliyê min, ji roja ku Ferîd hatiye kuştin, heya niha tu carekê min ji kesekî re negotiye ku Mala Bucaxiyan Ferîd kuştiye. Ne ji merivên xwe re û ne jî ji hevalên xwe re.

Beriya şerê Sêwregê dest pê dike, ez û çend heval, em ji DDKDê veqetiyan. Gava şer dest pê dike, em dibêjin ev şer derveyî îradeya me derketiye, li hember êrişan em ê li ba xelkê cîhê xwe bigrin, em ê di rojên teng de li ba wan bin. Dibe ku wê gavê em nikarin encamên siyasî bi teferûat analîz bikin, lê ez hîs dikim ku şerê Sêwregê di bingeha xwe de li hember hereketa kurd, li hember serwexbûyînê, li hember şiyarbûna gelê kurd e. Armanc sabotekirina vê pêşveçûnê ye. Kes me fahm nake, yan jî naxwazin fahm bikin.

Hevalên min ên DDKDê, PKK, rojnameyên tirkan ji bo me dibêjin, ew dixwazin heyfa Ferîd bigrin, ji ber wê yekê li Sêwregê dimînin. Bi taybetî di nav hevalên DDKDê de ev gotinên hanê li hember min tên bikaranîn. Neco kiribûn qaçaxçî, min jî dikin eşîretçî. Li gelek ciyan û li gelek cemaetan ev gotina bi zanîn yan nezantî tê bikaranîn.

Hevalên KAWAyê jî xwe kerr dikin, înformasyona ku ez didim wan di pişt guhên xwe re davêjin. 27 sal şûn de ez ji Ado û Brahîm dipirsim ka wan ji bo çi înformasyona ku min dabû wan avêtin pişt guhên xwe? Bersiva ku didin min wisa ye: “Gor qenaeta me, we dixwest em û PKK têkevin rûyê hev ku meydan ji we re bimîne.”

Gava hevalên KAWAyê wisa difikirin û hevalên DDKDê me bi eşîrtiyê îtham dikin, li ser me agir dibare, kevneperestên ku hefsarên xwe diqetînin, gulleyan li ser heval û hogirên me, malên me, merivên me, pîrek û zarokên me de dibarînin. Kemal Uzun, pismamê min, hevalên min ên delal û xweşik Zubeyir Mizrakli, Esat Yildirim, Mustafa û Nasrettîn Îbîş tên kuştin. Pismamê min Mehemed û Elî Uzun gava li berberxana xwe ya li Qeleboxaziyê kar dikin, mêrkuj gulleyên xwe li ser wan vala dikin. Namirin, lê dikevin halekî xirab; dest didin ser garaj, yazîxana otobus û loqanta bavê min û hîna jî di destê wan de ne. Tu kesek ji merivên me nikarin biçin ser kar û barên xwe; tî û birçî li malên xwe rûdinin. Yên ku xwe ji destê kevneperestan, cendirme û polîsan xilas dikin, mal û mulkê xwe, erdê bav û kalan berdidin û dikevin ser riya maciriyê. Ne tenê merivên min, xelkê reben û belengaz, bêsuc û bêsebeb tê kuştin, tê girtin, ji lêdan û îşkencê derbas dibin, mal û mulkê wan talan dibe û hwd.

Naxwazim zêde dirêj bikim, bi şerê Sêwregê re li hember hereketa kurd komplo çêdibe, komplo bi kuştina Ferîd dikeve tetbîqatê û gava komplo bi ser dikeve eniya welatparêzan winda dike, yên winda dikin em hemû ne.

1.Çetin Gungor (Semir), yek ji damezirînerên û endamê komîteya merkezî ya PKKê bû. Dema wek berpirsiyarê PKKê li Ewrûpayê kar dikê, ji PKKê vediqete. Sedemên veqetandina xwe bi daxûyaniyekî ji 34 rûpelan di tarîxa 1984. 08. 16 de ji xelkê kurd û tirk re pêşkêş dikê. Li wir behsa kuştina Ferîd jî dikê.

Çetin Gungor di 1986an de bi destê PKKê li Swêdê tê kuştin.

2.Hasan Huseyin Karakuş ji Sêwasê ye, di herêma Hîlwan-Swêregê de wek qomutanê eskerî yê PKKê kar dikê û tê girtin. Di hefsa pêncemîn a Diyarbekîrê de dibê îtirafçî û cara yekemîn behsa kuştina Ferîd dikê. (Dadgeha Orfî-îdareyê (Sıkıyönetim mahkemesi) ya Yekemîn, îfada wî ya dawiyê ku li dosya 1981/134 an. e.n.) Gor îfadeyên wî PKKê Ferîd daye kuştin û yên wezîfa kuştinê aniye cîh Emîn Dal û Alî Yaverkaya ye.

H. Huseyîn Karakuş ji hefsê derket, nuha bi çi mijûl dibe, li ku dijî ez nizanim.

3.Serhat Bucak lawê Faîk Bucakê ku damezirîner û sekreterê Partî Demoqratî Kurdistana Tirkiyê bû. Serhat jî wek min ji Swêregê ye, abûqat û siyasetmendar e, wek hemû kurdan bi siyasetê re mijûl dibê, nuha nizanim rewşa wî çi ye, lê demekê ew jî di nav PKKê de dixebitî. Di wê demê de, gava ji Ewrûpayê dizivire Tirkiyê, Mustafa Aksakal wî bangî mala xwe dike û jê re dibêje, hevalên me kuştina Ferîd itîraf dikin û li xwe rexne digrin. Mistefa jî ji Serhat re dibêje, ger hevalên te dilsoz in bila di huzûra xelkê de, di weşan û rojnamên xwe de li xwe rexne bigrin.

Ev înformasyona di nameya ku Mustafa Aksakal ji min re dişînê, cîh digre. Yê di vê kitabê de bi navê Misto cîh digrê, Mustafa Aksakal e û ji gundê Hîlwanê ye. Mustafa hevalê Ferîd e,

4.Yê di kitabê de bi navê Brahîm cîh digrê Îbrahîm Kureken e. Di tarîxa 27. 11. 2005an de di malpera Kurdînfo de, bi navê “Bîranîna Ferîd” nivîsarekî wî cîh digrê. Di nivîsara xwe de behsa kuştina Ferîd dikê. Îbrahîm jî wek Mustafa hevalê Ferîd e, ji Swêregê ye. Roja ku Ferîd tê kuştin li Anqerê ye, nagîhîjê ser cenaza Ferîd.

5.Alî Yaverkaya jî wek Emîn Dal ji xelkê Hîlwanê ye, cardin wek Emîn di destpêka PKKê de wek milîtan di kar û barên PKKê de beşdar dibe. Alî jî wek gelek kesan hat girtin, di hefsa Pêncemîn de hember zilm û zorê li ber xwe da, ji hefsê derket û cardin li nav PKKê cîhê xwe girt. Nuha ji PKKê veqetyaye.

Di malpera Nasnamê de, di tarîxa 24. 11. 2005an de bi navê Xoca, zilamek ji Alî Yaverkaya dipirse:

-Her kes dibêje te Ferîd kuştiye?

-Her kes wisa dizane û wisa dibêje, lê ez bi dilsoziya xwe dibêjim ku yê Ferîd kuşt ne ez im.

-Kî ye?

-Emîn Dal e.

-Pekî, yên emir dane kî ne?

-Tu jî dizanî ew kî ne, tu bi xwe jî di bin emrê wan de xebitiyî.

-Belê.

Cardin Ji derveyî gotinên jorîn, Alî ji derveyî resmiyetê (gayrî resmî) wisa dibêjê, “Konseya eskerî ya ku wê gavê ji Mehmet Karasungur, Riza Altun û Fehmî Yilmaz pêk hatiye, biryara merkezî ya kuştina Ferîd bi destê Emîn Dal tetbîq dike.”

Mehmet Karasungur li Kurdistana Başûr tê kuştin, Emîn Dal jî hatiyê kuştin. Riza Altun li Ewrûpayê dijî û mirovê PKKê ye.

Fehmî Yilmaz, eslê xwe laz e, di hefsa Yekemîn a Diyarbekîrê de li qawîşa min dima. Çetîn Gungor di daxuyaniya xwe de dibêjê, "Gava Fehmî Yilmaz tê girtin, esker dibe ku ew mirovê MÎTê ye." Cardin dostê min rehmetî Emîn Yavuz ku ew jî di qawîşa min de dima, ji min re digot, "Paşa, bi vê zilamî re zêde qisa meke, ew mirovê MITê ye." Fehmî Yilmaz ji hefsê derket û nuha li Îzmîrê dijî.

6.Ado hevalê Ferîd e, yê ku gulleyan li Ferîd barandibû, wî bi çavên xwe ditibû.

7.Cardin xortê ku ez jê re dibêjim "Ahmed" wê gavê sempatîzanê me yê DDKDê ye.

***Bayê Azadiyê***

*Bayê Azadiyê va ye tê, ha tê*
*Bayê Azadiyê va ye tê, ha tê*

*Rabin, rabin, rabin, rabin bes êdî, ji xew rabin*
*rabin, rabin, rabin bes êdî, ji xew rabin*
*rabin, rabin, rabin bes êdî, ji xew rabin*
*bes êdî, ji xew rabin*

*Bêjin, bêjin bêjin bes êdî koletî, bêjin*
*Bêjin, bêjin bêjin bes êdî koletî, bêjin*
*Bes êdî koletî*

*Govend û def êdî ji bo Kurdistan e*
*Govend û def êdî ji bo Kurdistan e*

*Zilgit, zilgit, zilgit ji bo azadiyê*
*Zilgit, zilgit, zilgit ji bo azadiyê*
*Zilgit, zilgit, zilgit ji bo azadiyê*
*Ji bo azadiyê*


*Bêjin, bêjin, bêjin bijî azadî, azadî*
*Bimre koletî, koletî*
*Bimre koletî, koletî*

*Bêjin, bêjin, bêjin bijî azadî, azadî*
*Bêjin, bêjin, bêjin bimre koletî, koletî*
*Bimre koletî*

Gotin û muzîk: Ferîd UZUN




Zarokatîya Ferîd, 1963



Paşa Uzun, Ferîd Uzun û Saqîb Uzun, 1966



Di “Siverek Gençlik Spor” da Ferîd û hevalên wî, 1968




Ferîd Uzun di Girtîgêha Eskerî ya Dîyarbekirê da, 1973




Ferîd Uzun di Girtîgêha Eskerî ya Dîyarbekirê da, 1973.
Yê li ser piyê rastê Îhsan Yavuzturk e.



Ferîd Uzun di Girtîgêha Eskerî ya Dîyarbekirê da, 1973.
Yê li aliyê çepê Îhsan Yavuzturk e.



Îbrahîm Kureken, Ferîd Uzun, Îsmet Aksakal, 1976.



Ruhsar û Ferîd, 1969.



Mehmed Uzun, Ahmed Erdoxmuş, Paşa Uzun,
Qadirê Kuçukomera û Ferîd Uzun li Anqerê, 1975.



Ferîd û hevalên wî



Ferîd û hevalên wî li şevêkî, 1978.



Daweta Ferîd, 1974



Daweta Ferîd û Ruhsar û zarokên malê. 1974.




Ruhsar, Dakê Kejo û Ferîd, 1974.



Ferîd, Yekbûn û Ruhsar, 1975.



Apê Sefo, Yekbûn û Ferîd



Ferîd li Ceylanpinarê staj dikê, 1969.



Mîvanên daweta Birahîm Kureken û Leman Horoz, 1975, li Anqerê.



Ferîd û Ruhsar li Hecxidirê, 1978.




Lîsa Meslekî ya Keçikan ê Sêweregê, 1977



Ferîd û malbata xwe li Pamukkale, 1978.



Ferîd li mala bavê xwe




Wexta ku Ferîd xwendewan e



Bavê Min Emer û Diya mın (Xwişka Ferîd) Seadet



Diya Min Seadet û Demariya Min Fato

## xalê min ferîd

... Her cara ku diya min behsa serpêhatiyên xwe yan behsa bûyeran dike ez mat û heyran dimînim. Di gotinên wê de wext nîn e; ne saet, ne meh û ne jî sal... Wek em hemû însan di wextek bê serî û bê binî de dijîn, mesafeyên di nava bûyin û mirinê de wenda dibin. Diya min heyşt zarok anîne dinê, lê kîjan rojê an kîjan mehê zariyên wê çêbûne ne ew û ne jî kesekî din dizane.

Xwedê bi rehma xwe şa bike, apê min Hesen tarîxa bûyina zarokan bi destnivîsa xwe li paş resmekî ku me xistibû nav çarçoveyek û bi dîwarê odê ve bi dar da kiribû, dinivîsand. Gava ez ji hefsê derketim ew resm jî wek gelek tiştên din wenda bûbû. Ferîd di bihara sala 1945an da tê dinê, bes ez dixwazim ji devê diya xwe guhdariya bûyina Ferîd bikim.

Ji rojan rojekê, biharê bi giraniya xwe çarşefeke şîn li erdê Swêregê raxistiye, bîhna kulîlk û nefelan daketiye ser Swêregê, diya min û xwungên wê li Helawikê, li nav bîstên dendikên zebeşan diçînin. Xebera xêrê digîhîje bîstên ku dakê Kejo lawikek aniye dinê. Navê Ferîd li lêwik dikin. Beriya Ferîd sê keç û sê law hene, Ferîd dibe zarokê heftan, êdî li pêy Ferîd dakê Kejo zaro çê nake. Ferîd dibe zarokê dawî, dibe şîr û şekirê malê. Ew dibe zaroyekî biharê, zarokê kulîlkan, nefelan, giyayên êşîn. ...

ISBN 975627809-9
9 789756 278093

Vate